Rupel 1welat eminu++++++:Layout 1  16.09.2010  17:24  Page 1

KOMÎTEYA ZIMAN Û PERWERDEHIYÊ YA KCK'Ê PIŞTGIRÎ DA KAMPANYAYA HEFTEYEKÊ BOYKOTKIRINA DIBISTANAN

# Divê her tişt bi kurdî be

**KCK'ê destnîşan kir ku di hefteya boykotkirina dibistanên tirkî de divê gelê kurd zarokên xwe neşînin dibistanan û daxwaza perwerdeya kurdî bikin**

### BI ZIMANÊ XWE BIAXIVE, BINIVÎSE Û BIXWÎNE

Komîteya Ziman û Perwerdehiyê ya KCK'ê der barê kampanyaya boykotkirina dibistanan a ku ji aliyê TZPKurdî ve hatî destpêkirin de daxuyaniyek da. Komîteyê piştgirî da kampanyayê û got; "Divê her kes bi zimanê xwe biaxive, binivîse û bixwîne. Divê li dadgehan êdî herkes parastina xwe bi kurdî bike". Her wiha bal kişand ku "bi kurtasî divê di Kurdistana Xweser a Demokratîk de her tişt bibe kurdî."

### DIVÊ KES NEÇIN DIBISTANAN

KCK'ê bang kir ku bi vekirina dibistanên pergala înkar û tunekirinê ve divê hin rêzeçalakî bên destpêkirin. Komîteyê ji bo vê yekê bang li hemû xwendekaran, gel, ciwan, jin û rewşenbîrên kurd kir û wiha got: " Divê hefteyek dibistan werin boykotkirin. Di vê hefteyê de her malbat bi zarokên xwe re serî li cihê pêwendîdar bidin û bêjin: "Em bi zimanê xwe perwerdeyê dixwazin."... RÛPEL - 2

## Ji bo boykotê li her derê piştgirî

Piştgiriya ji bo boykota ku ji aliyê TZPKurdî ve tê organîzekirin her diçe berfirehtir dibe. BDP, YDGM, komeleyên çand û hunerê, hunermendên kurd, Goç-Der û gelek saziyên kurd ji bo boykotkirina dibistanan bang kir. Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş diyar kir ku ew piştgiriyê didin biryara boykotkirina dibistanan a ku ji aliyê TZPKurdî ve hatiye destpêkirin. Starta kampanyayê dê li Stenbolê bê dayîn. Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Samî Tan, got ku divê her gel bi zimanê xwe perwerdehiyê bibîne û ev yek dê yekitiya welat xurtir bike... R.4

www.welat.com

# Rojeva Welat

17 Îlon 2010 În Buha: 50 Kr Hejmar:10 E-mail: awelat2002@yahoo.com

DÎSA HÊZÊN DEWLETA KÛR LI SER KAR IN

# Beriya hevdîtina krîtîk 'teqîna kûr'



**Dewleta kûr dîsa li Colemêrgê li ser kar e. Hêzên tarî dîsa ji aliyê colemêrgiyan li ser sûc hat girtin. Teqîn di demeke krîtîk de pêk hat û bû sedem ku hevdîtina hikûmetê û BDP'ê bê betalkirin**

### DI ÇANTE DE 2 MAYINÊN ANTÎ-TANG HEBÛN

Li bajarokê Peyanisê yê Colemêrgê duh serê sibehê bombe di bin minibûsa sivîlan de teqiya. 10 gundi hatin qetilkirin û 2 kes jî bi giranî birîndar in. Piştî bûyerê li nêzî cihê teqînê çenteyekî leşkerî yê aîdî TSK'ê hate dîtin û di nava çentede 2 mayinên antî-tang ji aliyê fabrîkaya MKE ya TSK'ê ve hatine çêkirin, guleyên hewanê û kablo û kamera derketin. Gundiyan çente nedan leşkeran, da dozger. Gundiyên ku rastî qetlîamê hat referandûm boykot kiribû.

**Hêzên dewletê li Peyanisê kemîn li ber mînîbûsa gundiyan danî. 10 kes hatin kuştin, 2 kes jî bi giranî birîndar bûn. Qatilam çenteyên leşkerî ku mayin tê de li cihê bûyerê ji bîr kirin**

### TEQÎNA LEŞKERAN HEVDÎTIN DABÛ BETALKIRIN

Teqîna li Colemêrgê pêk hatî hevdîtina dê di navbera Hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, Gultan Kişanak û Cîgirê Serokwezîr Cemîl Çîçek, Wezîrê Edaletê Sadullah Ergîn de pêk bihata da betalkirin. Di 28'ê gulana 2009'ê de jî li Çela Colemêrgê mayinek teqiyabû 6 leşker hatibûn kuştin. Piştî vê teqînê Serokwezîr Erdogan hevdîtina xwe ya bi Serokê DTP'ê Ahmet Turk re betal kiribû. Piştre aşkera bû mayin leşkeran teqandiye... RÛPEL - 3

## Bersiva ji bo boykotê QETLÎAM

Her tişt li ber çavan e û zelal e. Dem û şêwazê êrîşê, cihê êrîş lê pêk hatî û nîşaneyên destpêkê yên xuya dikin şik û gumana ku ev bûyer ji aliyê hêzên dewletê ve hatiye kirin nahêle. Bûyera Şemzînan a duyemîn li gundê Peyanisê pêk hatiye û dîsa gelê Colemêrgê dewlet li ser sûc zeft kirine. Heke aliyekî hedefa vê êrîşê tolhildêrî û qetilkirina kurdan û colemêrgiyan be, aliyek jî hewldana têkbirin û pûçderxistina pêvajoya bêçalakîtiyê ye...

*Nivîsa Azîz OGUR* R.2



# 'Neyê ronîkirin em ji hikûmetê dizanin'

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, diyar kir ku ew vê bûyera bi êş bi zimanekî tund şermezar dikin. Demîrtaş, destnîşan kir ku dem û cihê bûyerê gelekî girîng e û wiha got: "Kesên gerîla qetil kiribin kî ne, kesên gel qetil dikin jî heman kes in. Di roja arefeyê de 9 gerîlayên PKK'ê hatin kuştin. Li gorî me di navbera van herdu bûyeran de têliyek heye. Tu şika me ji vê yekê tune. Ev bûyer jî beriya pêvajoya 20'ê îlonê ku biryara agirbesta KCK'ê bi dawî bibe pêk hat. Ji bo em bi hikûmetê re hevdîtinê pêk bînin hatin Enqereyê. Lê ji ber vê bûyerê me hevditin betal kir." Demîrtaş wiha got: "Eger beriya van hevdîtinan hin kes dê hin cihan bombeyan biteqînin û teşebûsên aştiyê asteng bikin û hikûmet jî teslîmî vê yekê bibe, diyar dike ku daxwaz û wêrekiya hikûmetê ya aştiyê nîn e. Hikûmet wiha jî nikare aştiyê bîne vî welatî. Diviya ku ligel hemû tiştan ev hevdîtin pêk bihatana. Di pêvajoyek wiha de ku bi taybetî îhtîmala KCD bi birêz Serokomar re hevdîtinê bike hebû de betalkirina hevdîtinan a bi vî şeklî bêkêrî û zafiyeta siyasî ye. Ev welat bi vî şeklî nikare bigihîje aştiyê. Helwesta tirsonek a hikûmetê ya rast em tirsandine bûyer wiha xeternak e û yên ev yek kirin gihîştin armanca xwe." Demîrtaş, got ku Eger bûyer neyê ronîkirin, ew ê vê yekê ji hikûmetê bizanin.



### KCK: Erîş karê kontra ye

Serokatiya Konseya Rêveberiya KCK'ê, êrîşa li dijî sivîlan a li gundê Peyanisê jî weke êrîşeke kontra nirxand û wiha got: "Tu eleqeya hêzên me bi teqîna di mînîbusa li gundê Peyanisê hate teqandin nîn e. Ev êrîş, êrîşeke kontra ye." KCK destnîşan kir ku dewleta Tirk piştî encamên referandûmê, Colemêrg wekî hedef nîşan daye.

# KCK: Divê her kes bi kurdî biaxive, binivîse, bixwîne

## Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê diyar kir ku di qonaxa çaremîn de êdî çareseriya pirsgirêka kurd xwe ferz dike û zimanê wê dê bi kurdî be

**BEHDÎNAN / ANF** - Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê der barê kampanyaya boykotkirina dibistanan ya ku ji aliyê TZPKurdî ve hatî destpêkirin de daxuyaniyek da. Komîteyê piştgirî da kampanyayê û got; "Divê herkes bi zimanê xwe biaxive, binivîse û bixwîne. Divê li dadgehan êdî herkes parastina xwe bi kurdî bike". Her wiha bal kişand ku "bi kurtasî divê di Kurdistana Xweser a Demokratîk de her tişt bibe kurdî."



Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê der barê biryara boykotkirina dibistanên tirkî de daxuniyek da û da diyarkirin ku di vê hefteyê de her malbat bi zarokên xwe ve bi awayekî girseyî serî li cihê pêwendîdar bidin û bêjin: "Em bi zimanê xwe perwerdeyê dixwazin."

Komîteyê bal kişand li ser hewldanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û aliyê kurdan yên çareserkirina pirsgirêkê bi riyên aştiyane û wiha berdewam kir; "Rêber Apo ji bo pirsgirêka kurd bi riya siyasî were çareserkirin, hewldaneke bêhempa da nîşandan . Ji bo vê jî ji 1993'yan ve tam şeş caran yekalî agirbest îlan kir. Li hemberî vê dewleta tirk û hikûmetên wê tu bersiveke erênî nedan". Komîteyê bibîr xist ku berovajî vê siyaseta înkar û tunekirinê bi şewazên cur be cur berdewam kirin û herî dawî jî hikûmeta AKP'ê bi awayekî gelek xeternak vê siyasetê berdewam dike.

Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê di daxuyaniya xwe de wiha got: "Li hemberî vê siyasetê Rêber Apo heta 31'ê gulana 2010'an aştî û guftugo ferz kir. Dema ku dît bersiveke înkar û tunekirin tê dayîn, got: "Ez xwe ji navberê dikşînim." Dema Rêber Apo ji navberê vekişiya û bibîr xist ku Tevgera Azadiyê pêngava 1'ê Pûşperê da destpêkirin û wiha berdewam kir; "Ev di heman demê de tê wateya destpêkirina Qonaxa Çaremîn. Niha divê em vê rastiyê bibînin. Heke em li gorî vê pêvajoyê pêngaveke rast birêve nebin, em ê fersendeke dîrokî winda bikin. Ji ber vê jî destpêkirina pêngava 1'ê Pûşperê gelek girîng bû. Jixwe bandoreke mezin li ser dewlet û hikûmeta AKP'ê kir. Di encamê de bi Rêber Apo re hevdîtin hate kirin. Li ser banga Rêber Apo, rêxistinên civaka sivîl, KCD, BDP'ê û bi hatina meha Remezanê, Tevgera Azadiyê ji parastina çalak (aktîf) derbasî parastina tebat (pasîf) bû. Êdî ev wê li gorî nêzikatiya dewlet û hikûmeta AKP'ê zelal bibe".

### Çareserî: Xweseriya Demokratîk e

Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê diyar kir ku di vê qonaxa çaremîn a stratejîk de êdî çareseriya pirsgirêka kurd xwe ferz dike û wiha got; "Ev çareserî jî modela 'Xweseriya Demokratîk' e" û bi bîrxist ku Tevgera Azadiyê biryara avakirina Xweseriya Demokratîk daye û daxuyaniya xwe wiha berdewam kir; "Ya yekemîn ger dewlet vê bipejirîne wê li gorî fomula dewlet+demokrasî were pêkanîn. Ya duyemîn jî ger dewlet vê nepejirîne em ê vê bixwe ava bikin."

### Divê zimanê kurdî bê misogerkirin

Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê bibîr xist ku her sal di meha Îlonê de pêngava têkoşîna fermîkirin û xwedî derketina ziman û çanda kurdî tê destpêkirin û wiha got; "Armanca têkoşîna vê pêngavê ew e ku zimanê kurdî di serî de li çar beşên Kurdistanê û hemû cihê kurd lê dijîn fermî bibe û bikeve bin misogeriya destûra bingehîn". Komîteyê ragihand ku ew ji ber dixwazin pêngava îsal bi boykotkirina dibistanên înkar û pişaftinê dest pê bike û bi şêwazên çalakî û têkoşîneke dewlemend û pir alî bidome" û wiha domand; "Divê ji her demê zêdetirîn di pêvajoya vê pêngavê de xwedî derketin û têkoşîna ziman û çanda kurdînî bigihe asteke herî bilind. Yanî divê em pêngava îsal bikin pêngava bi destxistina xweseriya demokratîk û perwerdehiya bi zimanê zikmakî."

### Ziman, Perwerde û Hîndekarî

Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê ragihand ku di avakirina Xweseriya Demokratîk de "ziman, perwerde û hîndekarî" stûneke bingehîn e, heta niha perwerde û hîndekariya dewleta tirk li ser gelê kurd roleke asîmîlasyonê lîst û wiha pê de çû; "Ango ji bo ziman û çanda kurdî tune bikin her cure rêbaz meşandin. Her çiqasî tam serneketibin jî lê hin encam jî girtin. Têkoşîna Tevgera Azadiyê pêşiya qirkirina ziman û çanda kurdî girt, lê belê tam ji holê ranekir. Ev jî wê bi avakirina Xweseriya Demokratîk were temamkirin. Niha em ê ji bo "ziman, perwerde û hîndekarî" bi du awayan têkoşîna xwe bilind bikin. Ya yekemîn divê em bi çalakiyên cur be cur fermîkirina "ziman, perwerde û hîndekariya kurdî" li ser dewletê ferz bikin. Ya duyemîn jî divê em pergala xwe ya" ziman, perwerde û hîndekariya kurdî" ava bikin."

### Ji pergalê dewletê qutkirin divê

Di daxuyaniyê de, hat xwestin ku kurd xwe hêdî hêdî ji pergala dewletê qut bikin û got; "Berî her tiştî, divê hem em xwe ji pergala dewletê her diçe qut bikin û li gel vê jî Xweseriya Demokratîk ava bikin. Di vê mijarê de divê di serî de em xwe ji pergala perwerdeya înkar û tunekirinê ya dewleta tirk qut bikin. Dibe ku ev yekser nebe lê divê ev gav bi gav were dest pê kirin".

## Divê kes neçe dibistanan

Komîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê bang kir ku bi vekirina dibistanên pergala înkar û tunekirinê ve divê hin rêzeçalakî werin destpêkirin. Komîteyê ji bo vê yekê bang li hemû xwendekaran, gel, ciwan, jin û rewşenbîrên kurd kir û ev xal rêz kirin:

✓ Divê hefteyek dibistan werin boykotkirin. Ango kesek neçe dibistanan.

✓ Di vê hefteyê de her malbat bi zarokên xwe re bi awayekî girseyî serî li cihê pêwendîdar bidin û bêjin: "Em bi zimanê xwe perwerdeyê dixwazin."

✓ Divê her kes bi zimanê xwe biaxive, binivîse û bixwîne.

✓ Divê li dadgehan êdî her kes parastina xwe bi kurdî bike, ji bo vê dema dadgehê jî werger bixwazin.

✓ Divê hemû cih ji bo tabeleyên wan bibin kurdî, komî serî li saziyên pêwendîdar bidin. Heke ev nepejirandin jî her kes bixwe van bike kurdî.

✓ Ji bo navên bajar, navçe, bajarok, gund û taxan bibin kurdî serîlêdanên komî werin kirin. Dema ev neyê pejirandin jî tabeleyên kurdî werin bicihkirin.

✓ Zimanê xweseriya demokratîk bi kurdî ye. Yanî bi kurtasî divê di Kurdistana Xweser a Demokratîk de her tişt bibe kurdî.

## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Peyva neyînî... Ji bo gotin û biwêjên taybet ku ji aliyê civat an jî kesên serserî ve tên bikaranîn **2.** Stokholm paytexta kîjan welatî ye... Agir **3.** Herf **4.** Cejn, eyd... Dua, niyaz**5.** Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin**6.** Bajarekî Tirkiyeyê... Bi erebî "ez" **7.** Cama mîkroskopê... Amûreke çandiniyê ya ku pê zad tê çinîn **8.** Rojek... Rehîbê Budayan 9. Marê mezin... Nexweşiyek

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Nîşandeka ku dengan dide xuyakirin, mirov çawa li amûrekê dixe û distrê... Herfa pêşîn a elîfbaya erebî **2.** Xwarinên ji şîr **3.** Rengek... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû**4**. Pevdenga kurdî... Demên rojê... Daçekek **5.** Alif, xwarina sewalan... Hêjmarek6. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Notayek... Beyreq, sembola welatan **7.** Yezdanekî misrî... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê **8.** Dewara nêr... Îrade... Pirç 9. Keştiyê ku berê bayê lê ye... Postê gurandî





Azîz Ogur

abdulazizogur@hotmail.com



# Bersiva ji bo boykotê: Qetlîam

Yek ji warên destpêkê yên mirovahiyê ye Colemêrg. Bi erdnigariya xwe ya bêmînak, dewlemendî û serhildêriya gelê wê ji destpêka dîrokê heta roja me tu caran ji aliyê tu hêzan ve ne hatiye kontrolkirin. Bi tu awayî hikmê zaliman lê derbas nebûye û di her dema dîrokê de, di hebûna her zilmê de Colemêrg û gelê Colemêrgê serî hildane. Dîroka Colêmêrgê ku ji sed salan beriya mîladê dest pê dike bi her awayî dîroka mirovahiyê ye jî.

Bi çem û rûbarên xwe, bi deşt û zozanên xwe, bi çiyayên serhildêr Colemêrg ji roja roj de sembola kurdewariya qedîm e. Gelek şah, şahinşah, qral û împeratorî hatin û çûn lê bi tu awayî Colemêrg nehat zeftkirin. Warê destpêka çand, ilm-îrfan û netewebûna gelê kurd e. Dewlet, begîtî û mîrektiyên kurd li ser vê axê xwe bi xwe bi rêve birine û li hember her hewldana dagirkerî, mêtîngeriyê bûye bend. Hin ji artêşên bêhempa li çiyayên bilind qelibîn û nikaribûn derbas bibin telef bûn. Hin ji wan ketin ber xezeba zivistana Colemêrgê û tune bûn. Yên mayin jî bûn hedefa tîrên gelê Colemêrgê ku zirxên herî qalin û migor jî derbas dikirin. Di her derbasokê de tirsa herivîna bi serê wan de ya latên bilindahiyan kabûsa herî mezin a dagirkeran bû. Dîrok tije mînak e; têkçûna artêşa Îskenderê Makedonyayî, rêwîtiya 10 hezaran a li herêmê mînakên biçûk ên vê yekê ne.

### Remza serhildêriya kurd

Heta roja me jî Colemêrgê taybetmendiya xwe parast. Ne pêşketina teknolojiyê, ne polîtikayên şerê taybet tu hewldana hat meşandin nikaribû taybetmendiya Colemêrgê ya serhildêr biguherîne. Di destpêkirin û pêşxistina Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de erdnîgarî, welatparêzî û lehengiya zarokên Colemêrgê cihê serbilindiya gelê kurd e.

Bi taybetî di çend salên dawî de dikare were gotin ku pêşeng û diyarkerê têkoşîna gelê kurd Colemêrg e. Roja bê serhildan tune ye. Herî zêde Colemêrg li şehîdan xwedî derdikeve, herî zêde Colemêrg li nirxên kurdewarî û destkeftiyên gelê kurd diparêze. Dema Colemêrg tê gotin an çalakiyeke zêrîn a gerîlayên kurd, an serhildan/berxwedaneke bêhempa ya colemêrgiyan li hember panzer, çek û hêzên dewletê an jî rêjeya herî bilind a dengên ji bo namzetên îradeya gelê kurd temsîl dikin tê hişê mirov.

### Tola ji sedî 93 boykotê hilgirtin!

Herî dawî di dema referandûmê de dema qala Colemêrgê hate kirin di hişê me tevan da rêjeya ji sedî 93 a neçû ser sindoqan û boykota herî bihêz a hate nîşandan di hişê me de ma. Tevî bi deh hezaran leşker, bi sedan qereqol, bi hezaran cerdevan û her cure rêbazên şerê taybet jî Colemêrg warekî azad ê gelê kurd e. Colemêrg nîşaneya serxwebûn, serî netewandin û kurdewariyeke bêqisûr, qedîm a hêza xwe ji destpêka mirovahî û dîrokê digire ye. Colemêrg warê ku herî zû û herî bihêz banga Xweseriya Demokratîk pêşwazî kiriye û pêwistiyê wê bicih anîne.

### Dîsa gundiyê sivîl bûne hedef

Lewra li gundê Peyanisê girêdayî bajarokê Silehê yê Colemêrgê li hemberî minibûsa rêwiyan êrîşek pêk hat û herî kêm 9 kesan jiyana xwe ji dest da. Li Peyanisê jî ji 970 kesî tenê 5 kes çûbûn ser sindoqê û bi rêjeya ji sedî 99 referandûm hatibû boykotkirin. **Ên çûne ser sindoqê jî rayedarên qereqolê bûn.**

Sedem û bersûcên êrîşa duh diyar in. Êrîş encama helwesta dewleta tirk a tolhilderiyê ye. Li hemberî Colemêrga ji sedî 93 bi boykotkirina referandûmê dewlet û siyaseta dagirker a dewletê red kir bû hedefa hêzên dewletê.

Ji xwe hemû dane vê rastiyê radixin ber çavan. Piştî bûyerê li nêzî cihê teqînê çanteyeke leşkerî ya aîdê TSK'ê hate dîtin û di nava çanteyê de 2 mayinên antîtang ji aliyê fabrîkeya MKE ya TSK'ê ve hatine çêkirin, guleyên hewanê û kablo û kamera derketin. Leşkerên ku xwestin çenteyê hatiye dîtin desteser bikin êrîşî gundiyan kirin û gundiyan jî bersiva wan da. Çenteyên mayinan tevî hemû hewldanan jî gundiyan parastina û teslîmî dozgeriyê kirine.

### Bûyer Şemzînana duyemîn e

Her tişt li ber çava ye û zelal e. Dem û şêwazê êrîşê, cihê êrîş lê pêk hatî û nîşaneyên destpêkê yên xuya dikin şik û gumana ku ev bûyer ji aliyê hêzên dewletê ve hatiye kirin nahêle.

Bûyera Şemzînan a duyemîn li gundê Peyanisê pêk hatiye û dîsa gelê Colemêrgê dewlet li ser sûc zeft kirine.

Heger aliyekî hedefa vê êrîşê tolhildêrî û qetilkirina kurdan û colemêrgiyan be, aliyek jî hewldana têkbirin û pûçderxistina pêvajoya bêçalakîtiyê ye.

Heger em tevahiya pêvajoyên bêçalakîtî û agirbestan bînîn bîra xwe em ê bibînin ku tim li herêmê bi taybetî Colemêrg û Şirnexê bi êrîşkirina sivîlan û bi taybetî teqandina mayinan di bin minîbûsên sivîl an gulebarankirinê de provokasyon pêk hatine. Piştrast bû ku bûyerên beriya niha ji aliyê hêzên dewletê ve hatine kirin. Êrîşa duh jî mîna dubarekirina heman fîlmî dîsa bi heman şêwazî pêk hat.

Dewleta qatil dîsa li Colemêrgê li ser kar e û bi qetilkirina colemêrgiyan peyama 'ji mirinê pêde tu mafê we nîn e' dide tevahiya gelê kurd. Colemêrgî jî bi girtina li ser sûc a dewletê û berxwedana xwe ya didomînin peyamê didin dewleta dagirker û dibêjin, 'berdel çi dibe bila bibe heta em azad bibin em ê têkoşînê bidomînin".

Dewleta kujer li Colemêrgê li ser kar e, ji ber ku Colemêrg kelemê çavê xayin, dijmin û mêtîngera ye.

www.arsivakurdi.org

## Gelo hayê Cemîl Çiçek ji teqînê hebû!

ENQERE - Piştî teqîna li Colemêrgê pêk hatî hevdîtina dê di navbera Hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, Gultan Kişanak û Cîgirê Serokwezîr Cemîl Çiçek, Wezîrê Edaletê Sadullah Ergîn de pêk bihata, ji aliyê Çiçek û Ergîn ve hate betalkirin. Di 28'ê gulana 2009'ê de jî li Çela Colemêrgê mayînek teqiyabû bû 6 leşker hatibûn kuştin. Piştî vê teqînê Serokwezîr Erdogan hevdîtina xwe ya bi Serokê DTP'ê Ahmet Turk re betal kiribû. Piştre aşkera bû mayin leşkeran teqandiye.

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş li navenda giştî ya partiya xwe daxuyaniyek da çapemeniyê û ev agahî dan: "Duh (pêr) bernîvrokî bi birêz Cemîl Çiçek û Wezîrê Edaletê Sadullah Ergîn re ji bo ku îro (duh) saet di 14.00'ê de hevdîtinekê pêk bînin, jiwaniya me çêbû. Hevdîtin dê di odeya Serokwezîr de bi tevlibûna Hevseroka me Gultan xanimê pêk bihata. Ev hevdîtin duh (pêr) pêk hat. Ev hevdîtin daxwazeke dualî bû. Beriya saetekê dê çapemenî jî bihata agahdarkirin. Hevdîtin û encamên hevdîtinê dê bi raya giştî re hatibûna parvekirin. Bitenê yên ku telefonên me guhdarî dikin der barê hevdîtinê de agahdar bûn. Tu kesê din nedizanî. Ji bo ku geşedanên provokatîf çênebin em titîz tevdigeriyan. Heta deqeya dawiyê bi raya giştî re nedihate parvekirin. Îro (duh) ji bo hevdîtinê, dema em ji Amedê çûn balafirgehê agahiya me ji bûyera li Colemêrgê çêbû. Dema li Enqereyê em ji balafirê peyabûn jî me bihîst ku hevdîtin hatiye betalkirin."

# Dewlet li ser kar zeft bû nikarî delîlan veşêre

Hêzên dewletê li Peyanisê kemîn li ber mînîbûsa gundiyan danî. Mînîbûs hate teqandin. 10 kes hatin kuştin, 2 kes jî bi giranî birîndar bûn. Qatilan çenteyên xwe yên delîl tê de bûn li cihê bûyerê hiştin. Dewlet careke din li ser kar zeft bû

COLEMÊRG / DÎHA - Duh serê sibê mînîbûsa ji Peyanisê rêketî, 12 kes lê siwar bibûn. Kesên li mînîbûsê siwarbûyî dê cenazeyê lêzimê xwe pêşwazî bikira. Lê hin zaliman kemîn li ber wan danîbû. Ajokarê mînîbûsê û 9 kesên ku li mînîbûsê hatin qetilkirin. 2 kes jî birîndar bûn. Walîtiyê bi hinceta çêkirina rê, rê dabû girtin. Înîsiyatîfa Gel a Kurdistanê banga serxwebûnê li gel kir.

Piştî teqîna mayina li Peyanisê di bin mînîbûsa gundiyan de di navbera leşkerên qereqol û gundiyan de şer qewimî. Gundiyan 100 metreyan nêzî cihê bûyerê çanteyeke ku mayinên antî-tang ên TSK'ê û guleyên hawanê tê de bûn dît û dest danîn ser çanteyê. Dozger çû cihê bûyerê û alozî didome. Li bajarokê Peyanisê yê Colemêrgê duh serê sibehê bombe di bin mînîbûsa gule teqiya û 10 gundiyên ku zarok jî di nav de hebûn jiyana xwe ji dest dan 2 gundî jî bi giranî birîndar bûn. Piştî bûyerê li nêzî cihê teqînê çanteyeke leşkerî ya aîdê TSK'ê hate dîtin û di nava çenteyê de 2 mayinên antî-tang ji aliyê fabrîqeya MKE ya TSK'ê ve hatine çêkirin, guleyên hewanê û kablo û kamera derketin.



Wan ji wir bigirin' hate bihîstin.

### Çente nedan leşkeran

Leşkerên qereqola Peyanisê xwestin ku çenteya ku malzemeyê TSK'ê jê derketin ji aliyê gundiyan ve hate desteserkirin, ji wan bigire. Lê gundiyan li ber xwe da û çante nedan leşkeran. Li ser vê yekê alozî derket û leşkeran gule berdan hewayê. Gundiyan bi keviran bersiv da leşkeran û 6 leşker birîndar bûn. Li ser berxwedana gundiyan a li dijî leşkeran dozger hate cihê bûyerê. Ji çanteyê mayin, kablo, kamera, qama û guleyên hewanê yên aîdî TSK'ê derketin.

### Diyalogên leşkeran

Gundiyan ji cihê bûyerê ragihand ku dema wan li cihê bûyerê lêkolîn dikir û leşkeran tedbîrên ewlekariyê digirtin, ji bêtêla (telsîz) leşkeran dengekî wekî; 'Me amûrên xwe di çanteyekê de li cihê bûyerê ji bîr kirine.

### 10 kuştî 2 birîndar

Eşref Gur, Aydin Erol (ajokar), Şirin Kurta 11 salî, Enes Erol, Abubekîr Îdem, Cane Dayan, Raîfe Çiftçî, Semîha Dayan, Nurullah Çiftçî û Umut Çiftçî di encama teqîna çêbûyî de li cihê bûyerê mirin. Hate hînbûn ku kesên bi giranî birîndan bûn rakirine nexweşxaneyê. Di dema teqînê de 8 kes li cihê bûyerê û 2 kes jî piştî rakirine nexweşxaneyê mirin.

### Rê dabû girtin

Walîtiya Colemêrgê pêr êvarê bi hinceta dê tadîlata riya Silehê û Colemêrgê pêk bê; rê dabû girtin. Her wiha peyanisiyên piştî bûyerê ji ber çanteyên li cihê teqîn lêçêbûyî desteser kirî, qala diyalogên leşkeran ên di bêtêla de dikin. Ligel van diyalogan, duh û pêr ji qereqola Peyanisê çi axaftin hatine kirin? Mimkûn e ku bêne tespîtkirin. Kesên ku piştî teqîn pêk hatî talîmata girtina çanteyên li cihê teqînê hatiye jibîrkirin didan, mimkûn e ku duh û pêr danûstandina wan bi qereqolê re çêbûye.

### Ji Înîsiyatîfa Gel bang

Înîsiyatîfa Gel a Kurdistanê ji ber teqîna li Peyanisa Colemêrgê pêk hatî daxuyaniyeke nivîskî weşand û banga çalakiyê kir. Înîsiyatîfa Gel banga banga serhildanê li gelê kurd kir.




### Çenteya 'Hakkarî Dag ve Komando Tugayi'

30 metre nêzî cihê teqîna li Colemêrgê pêk hat, çenteya li ser nivîsa "Hakkarî Hatirasi Dag ve Komando Tugayi" nivîsiyî û gelek konserveyên 'ton baligi', çîkolata, cola û gelek torbeyên xwarinê hatin dîtin.

Nêzî cihê teqîna li Gundê Peyanisê yê Colemêrgê pêk hat û 10 kesî jiyana xwe ji dest da û 2 kes jî birîndar bûn 2 çanteyên leşkeriyê hatin dîtin. Di çanteyan de de 2 mayinên antî-tang ên neteqiyayî guleyên hewanê yên MKE'yê û sîstema teqîna mayinan, kamera, kasatura, bombeyek destan a bi paraşutê têxwarê û çanteyê sîmgeya "Hakkari Hatırası Dağ ve Komando Tugayı" li ser heyî û gelek alavên xwarinê yên konserveya 'ton baligi', çîkolata, cola, penîr, nan û madeyên din yên xwarinê hatin dîtin. Li gorî agahiyên hatine girtin, teqemenî bi kabloya bi 40 metreyan ji cihê bûyerê hatiye direjkirin, hatiye teqandin.

Gundiyan diyar kir ku nêzî cihê bûyerê 4 kîlometreyan Qereqola Peyanisê heye û ji bilî leşkeran tu kesên din nikarin teqameniyê danîn ser rê. Gundiyan, anîn ziman ku teqîn ji aliyê leşkeran ve pêk hatiye. Leşkerên xwaztin çanteyan desteser bikin gundiyan bi keviran bertek nîşan da û leşkeran jî gule berî hewa dan.

### Gundiyan referandûm boykot kiribû

Ligel ku li Peyanis baregeha leşkeriyê heye û di gund de cerdevan jî hene, di referandûmê 12 îlonê de ji 970 hilbijêran tenê 5 kes çûne ser sindoqan û 965 kesan jî destek dabû biryara BDP'ê ya boykotê. Gundiyên ku piştî teqînê nêrînên wan hatine pirsîn beyî ku bixwazin navê xwe bi lêv bikin, digot; yek ji sedemên vê qetlîamê jî tevlîbûna biryara boykotê ye.

## BDP'ê heyet şand cihê teqîn lê qewimî

BDP'a Colemêrgê, têkildarî têqîna li nêzî gundê Peyanisê qewimî, heyetek şand cihê bûyerê.

Heyata ji 10 kesî pêk tê ya Cîgirê Şaredarê Colemêrgê Nurullah Çiftçî, Wekîlê Serokê BDP'a Bajar Orhan Koparan, endamên Meclisa Giştî ya Bajar û Şaredariya Colemêrgê jî di nav de, çûn cihê bûyerê. Serokê BDP'a Bajar Orhan Koparan ku der barê mijarê de agahî dan û diyar kir ku dê li cihê bûyerê lêkolînan bikin û wiha got: "Ev bûyer li hemberî biryara bêçalaktiyê ya dê di 20'ê îlonê de bidawî dibe hatiye kirin. Ev yek teşebûsa provokasyona hêzên veşartî û kûr e. Dixwazên çareseriya pirsgirêka kurd a demokratîk asteng bikin. Yên ev bûyer pêk aniye, bi taybetî Colemêrg û bi giştî jî karên kesên başiya kurdan naxwazin e. Şopa hêzên dewleta kûr lê heye."

## Li Şemzînanê 2 tîmên taybet hatin kuştin

BEHDÎNAN / ANF - Hêzên Parastina Gel der barê teqîna di 14'ê îlonê de li Şemzînanê li hemberî wesayîta polîsan de pêk hatî daxuyaniyeke nivîskî da. Hate ragihandin ku 2 tîmên taybet hatine kuştin û 3 polîs jî birîndar bûne. Her wiha li hemberî yekîneyeke leşkerî jî çalakî pêk hat û di vê çalakiyê de jî gelek leşker hatine kuştin.

## 'Rayedarên nexweşxaneyê berpirsiyar in'

STENBOL -Di qezeya trafîkê ya li navçeya Başakşehîra Stenbolê pêk hat de ji malbatekê 3 kes bi tevahî 13 kesan jiyana xwe ji dest da û 7 kes jî birîndar bibûn. Kesên jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûbûn piraniya wan welatiyên kurd in.

Xizmên wan jî ji ber ku di dema qezayê de xemsarî pêk hat û mudaxeleya dereng gazinc in. Hevsera Bahrî Şahbudak a di qezayê de jiyana xwe ji dest da Ayşe Şahbudak û xizmên Firat Şahbudak ên di qezayê de birîndar bûbû, diyar kir ku piştî qezayê dema ku li xizmên xwe digeriyan li hemû nexweşxaneyên aliyê Ewropayê geriyane û lê tu kesî agahî nedane wan. Xizmên birîndanan anîn ziman ku herî dawî xizmên xwe li nexweşxaneyên dewletê yên Samatya û Bakirkoyê peydakirine.

## KCK: Êrîş karê kontra ye

BEHDÎNAN / ANF - KCK'ê têkildarî êrîşa li Colemêrgê daxuyand ku êrîş karê kontra ye û li dijî helwesta Colemêrgê bi taybetî gelê Peyanisê ya di boykotê de pêk hatiye.

Serokatiya Konseya Rêveberiya KCK'ê, derbarê êrîşa li Colemêrgê daxuyaniyek da. KCK'ê, bi daxûyaniyê careke din bibîrxist ku pêvajoya bêçalakîtiyê heta 20'ê Îlonê ye, û got: "Piştî ku 9 gerîlayên me li Colemêrgê jiyana xwe ji dest dan, di çarçoveya mafê parastinê de çalakiyên leşkerî yên bi kontrol pêk hatin. Bêyî vê yekê hêzên me heta 20'ê Îlonê dê tu çalakiyan li dar nexin.

KCK'ê, êrîşa li dijî sivîlan a li gundê Peyanisê jî wekî êrîşeke kontra nirxand û wiha got: "Tu eleqaya hêzên me bi teqameyîna di munîbîsa li gundê Peyanisê hate teqandin nîn e. Ev êrîş, êrîşeke kontrayî ye. Gelê me yê welatparêz ê li Colêmergê di referandûmê de bi îradeyake mezin neçû ser sîndoqan û bi hejmareke mezin tevli boykotê bû.

Eger ji sedî 7 tevlibûna memûrên dewletê em li ber çavan bigirin, ligel cerdevanan herkesî li gorî welatpareziyê tevgeriyaye. Bi taybetî gundê Peyanisê ji sedî 99 tevli boykotê bûye, tenê 5 kes çûne ser sîndoqan. Ev êrîş li dijî helwesta gelê me yê welatparêz ê li Peyanisê wekî bersiv hatiye dayîn. Gelê me yê Peyanisê û herêma Silahiyê, tu zirar nedaye tevgera azadiya kurd û her tim li gorî welatparêziyê tevgeriyane. Bi van êrîşên namerd ên li dijî gelê me ya ji aliyê hêzên kontra yên girêdayî dewletê ve tê kirin, hewldanên tepisandinê yên li dijî helwest û îradeya gelê me ne. Hewldanên hesappirsîn û tunekirinê ne. "

### 'Xelkê Colemêrgê ne bi tenê ye'

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK destnîşan kir ku dewleta tirk piştî encamên referandûmê, Colemêrg wekî hedef nîşan daye û wiha got: "Roja referandûmê, Serokwezîrê Tirk Erdogan, bi awayekî aşkera navê Colemêrgê got û ew hedef nîşan da."

KCK diyar kir ku êrîşa pêr li dijî xelkê Şemzînanê û heqareta Qeymeqamê li Şaredar Sedat Tûre kirî jî, helwesta dewleta tirk e. KCK da zanîn ku ji van êrîşan diyar dibe ku li dijî Colemêrgê siyasetên tepisandinê di dewreyê de ne û ev hişyarî kirin: "Di serî de Serokwezîrê Tirk, em hikûmeta AKP û dewletê hişyar dikin. Xelkê Colemêrgê ne bitenê ye. Êrîşa li vir hatî kirin, li dijî tevahiya gelê Kurdistanê ye."

### 'Dixwazin pêvajoyê têk bibin'

KCK ji malbatên kesên jiyana xwe ji dest dane û gelê kurd re, sersaxî xwest û wiha got: "Em kesên di vê êrîşa hovane de jiyana xwe ji dest dane, weke şehîdên aştî û demokrasiyê bi nav dikin û em ê wan her tim di têkoşîna xwe de bi bîr bînin."

Daxuyanî wiha bi dawî dibe: "Wer xuya ye ku hêzên kontra, di serî de Colemêrg, dê li hin deverên Kurdistanê êrîşên kontrawarî pêk bînin. Aşkera ye ku ev derdor van êrîşên kontra bixin stûyê tevgera me û pêvajoyê sabote bikin. Xuyaye ku hin hêzên tarî yên li herêmê hatine bicihkirin bi awayekî çalak di dewreyê de ne. Em bang li çapemeniya tirk dikin da ku li gorî wijdan tevbigere û heqîqetan ew çendî berovajî neke. Her weha em bang li aligirên aştî û demokrasiyê dikin da ku li dijî kirinên şerê taybet bibe xwedî helwest."

### Piştî boykotkirina referandûmê niha jî ji bo perwerdehiyê dibistan tên boykot kirin

# Niha jî dema boykota dibistanan e

**Piştgiriya ji bo boykota ku ji aliyê TZPKurdî ve tê organîzekirin her diçe mezin dibe. BDP, YDGM, komeleyên çand û hunerê, hunermendên kurd, Goç Der û gelek saziyên kurd ji bo boykotkirina dibistanan bang kir**

**AMED -** Meclisa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (DYGM), Goç-Der û hunermendên Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle Firatê piştgirî dan kampanyaya TZPKurdî ya "Boykotkirina dibistanan" ku ji bo ku kurdî bibe zimanê perwerdeyê û banga piştgiriya çalakiyê kirin.

YDGM'ê bi boneya piştgirî bide kampanyaya TZPKurdî li avahiya BDP'ê daxuyaniyek da çapemeniyê. Aktîvîstê YDGM'ê Hamît Aydin, diyar kir ku asîmîlasyon sûcekî mirovahiyê ye û da zanîn ku ev 80 sal in, li ser ziman û çanda kurdan asîmîlasyona hatiye meşandin. Aydin, anî ziman ku perwerdehiya zimanê zikmakî mijara herî girîng ya xweseriya demokratîk e û wiha domand: "Em bang li hemû kesî dikin ku li hemberî polîtîkayên asîmîlasyonê, zarokên xwe rênekin dibistanan û tevlî boykota TZPKurdî ku di 20-27'ê îlonê dê bê pêkanîn bibin." Aydin, da zanîn ku piştî boykotê dê bi hin çalakiyan piştgiriyê bidin kampanyaya TZPKurdî.

Komelaya Çand û Hunerê ya Dîcle Firatê piştgirî da kampanyaya TZPKurdî ya "Boykotkirina dibistanan" û bi heman armancê daxuyaniyek da çapemeniyê. Hunermend Şerko di daxuyaniya ku di avahiya komeleyê hat dayîn de destnîşan kir ku TZPKurdî bi vê kampanyayê ber bi azadiyê ve gaveke mezin avêtiye û banga tevlibûne ji kampanyayê re kir.

**Ji Goç-Der'ê jî piştgirî**

Goç-Der'a Amedê jî bi heman armancê li avahiya komeleyê daxuyaniyek da çapemeniyê. Serokê Goç-Der'a Amedê Muzaffer Ozdemîr di daxuyaniyê de axivî û got ku perwerdehiya zimanê zikmakî, mafekî navneteweyî ye. Ozdemîr, da zanîn ku Tirkiyeyê peymanên navneteweyî yên têkildarî perwerdehiya zimanê zikmakî heta niha îmze nekiriye û xwest Tirkiye jî van peymanan îmze bike. Ozdemîr di dawiya axaftina xwe de piştgirî da kampanyayê û banga piştgiriyê kir.



## 'Dibistanên vala dê daxwaza perwerdehiyê bide fêmkirin'

**AMED / DÎHA -** Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş diyar kir ku gelê kurd bi boykotkirina referandûmê re daxwaza Xweseriya Demokratîk kiriye û dê ji bo makeqanûneneke nû bixebitin. Demîrtaş anî ziman ku ji bo BDP'î siyasetê bi kurdî bikin dê kursa bi kurdî bidin BDP'iyan û dê piştgiriyê bidin biryara boykotkirina dibistanan a ku ji aliyê TZPKurdî ve hatiye destpêkirin û Demîrtaş wiha got: "Çawa ku sindoq vala derketin û daxwazên me hatin nîqaşkirin ger dibistan jî vala bin daxwaza perwerdehiyê jî dê bê fêmkirin." Demîrtaş balkişand biryara bêçalakîtiya PKK'ê û da zanîn ku dê ji bo çareseriyê bikevin nav hewldanan.

Boykotkirina dibistanan her diçe dikeve rojevê. Demîrtaş diyar kir ku ji bo BDP'iyan kursa ziman dane destpêkirin û wiha axivî: "Me ji bo hevalên me yên ku zaravayên kurdî nizanin kurs da destpêkirin. Em ê kursan bêtir aktîf bikin û mebesta me ew e ku hemû hevalên me bi rehetî bikaribin dema bangî gel bikin û di civînan de xwe bi kurdî bînin ziman." Demîrtaş got ku piştgiriyê didin kampanyaya boykota dibistanan a TZPKurdî û ev tişt gotin: "Ger dema dibistan destpêbike û kesek zarokên xwe neşîne dibistanan ew ê ji bo dewletê bibe peyameke girîng. Divê malbatên ku naxwazin ji bo zarokên wan perwerdehiya zimanê zikmakî bê dayîn jî piştgiriyê bidin vê kampanyayê. Qe nebe dê mafê zarokên din biparêzin. Çawa ku sindoq vala derketin û daxwazên me hatin nîqaşîn ger dibistan jî vala bin daxwaza perwerdehiya ji bo dê bê fêmkirin." Demîrtaş bang kir ku bila hemû kes piştgiriyê bide boykota dibistanan.

Demîrtaş diyar kir ku di referandûmê de boykot bi ser ketiye û der barê îdiaya ku gef li gel hatiye xwarin ev tişt gotin: "Gef xwarin hebû lê ev gef xwarin ji aliyê dewletê û AKP'ê ve hat xwarin. Roja referandûmê hemû der ji aliyê polîsan ve hatibû dorpêçkirin. Çoltêr di bin dorpêça leşker û panzeran de bû. Ji bo gel biçe ser sindoqan dewletê her tişt pêk anî. Li gelek deran anonsên ku bila gel biçe ser sindoqan hat kirin û gefa betalkirina kartên kesk hat kirin. Ger ev gefan nebûya boykot dê zêdetir bûya." Demîrtaş bilêv kir ku divê bi Ocalan re diyalog û muzakere pêk bê û nirxandinên piştî civîna MYK'a AKP'ê bê cidî û bêrêz bû. Demîrtaş da zanîn ku BDP dê xebata Xweseriya Demokratîk bimeşînin.

Demîrtaş da zanîn ku heta niha dewlet li gorî biryara bêçalaktiyê tevnegeriyaye û ber çavan negirtiye.

## Li Stenbolê dibistan tên boykot kirin

**STENBOL -** Starta kampanyaya TZPKurdî ya bi navê "Em perwerdehiya zimanê zikmakî dixwazin" ku di navbera 20-25'ê îlonê de dê bê lidarxistin, li Stenbolê bi beşdariya gelek saziyan bê dayîn. Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Samî Tan, piştgirî da kampanyayê û diyar kir ku lazim e her gelek bi zimanê xwe perwerdehiyê bibîne û ev pêkanîna perwerdehiyê dê yekitiya welat xurtir bike.

Xebata starta kampanyaya TZPKurdî ya bi navê "Em perwerdehiya zimanê zikmakî dixwazin" ku di navbera 20-25'ê îlonê de bê lidarxistin, li her derê bi awayekî lezgînî didome. Di çarçoveya kampanyaya boykotê de gelek saziyên sivîl jî dê piştgiriyê bidin kampanyayê û xebatan dimeşînin. Kampanya dê di 17'ê îlonê de li ÎHD'a Stenbolê bi daxuyaniya çapemeniyê ya TZP-Kurdî startê bide. Di 18'ê Îlonê de jî 44 rêxistinên civakî yên sivîl dê hevbeş daxuyaniyê bidin çapemeniyê. Di 19'ê îlonê de di pêşengiya TZP-Kurdî de saziyên civakî yên sivîl li Qada Galatasarayê biciviin û heta Taksimê bimeşin. Di 23'ye îlonê de li navçeyên Bagcilar, Sultanbeylî û Sultangazî dê hemwext daxuyanî bên dayîn. Fînala kampanya boykota perwerdehiyê jî dê ji aliyê Ciwanên Welatparêz û Demokratîk li Kampusa Beyazidê ya Zanîngeha Stenbol bi daxuyaniyek girseyî û dersdayina kurdî bi dawî bibe.

**Çima kurdî parçe dike?**

Samî Tan, piştgirî da kampanyayê, bang li hemû ciwanên kurd û malbatên kurd kir ku beşdarî kampanyayê bibin û piştgiriyê bidin kampanyayê. Tan, bertek nîşanî kesên dibêjin 'Dê kurdî welat parçe bike' jî da û anî ziman ku li dibistanan Tirkiyeyê zimanê îngilizî, firansî û almanî jî tê dayîn û van zimanan Tirkiye parçe nekiriye. Tan, destnîşan kir ku perwerdehiya kurdî jî Tirkiyeyê perçe nake û dê bêtir yekitiya Tirkiyeyê xurtir bike. Tan, daxuyand ku yekem car daxwaza perwerdehiya kurdî ji zanîngehan hat û niha jî vê kampanyayê li dibistanên seretayî didin destpêkirin. Tan, derbirî ku ew ji bo hemû zimanên din perwerdehiyê dixwazin.

## Li Îzmîrê ji bo meşa boykotê bang kirin

**ÎZMÎR -** KURDÎ-DER'a Îzmîrê, bi armanca piştgiriyê bidin kampanyaya boykotkirina dibistanan a TZPKurdî, dê di 19'ê îlonê de meşekê li dar bixe.

TZPKurdî bi slogana "Em perwerdehiya zimanê zikmakî dixwazin" di 20 û 25'ê îlonê de kampanyaya boykotkirina dibistanan dide destpêkirin. KURDÎ-DER'a Îzmîrê jî dê bi meşekê piştgiriyê bide vê kampanyayê. Serokê KURDÎ-DER'a Îzmîrê Mustafa Borak, diyar kir ku ew dê bi armanca piştgiriyê bidin biryara TZPKurdî dê di 19'ê îlonê ji ber Konaka Pîerê heta Sumerbanka kevin meşekê li dar bixin û daxuyaniyê bidin çapemeniyê.

Borak, da zanîn ku ew dê di 19'ê îlonê saet di 13.00'an de meşê li dar bixin û xwest ku hemû kes tevlî meşê bibin.

## Êlih amedekariya boykota duyemîn dike

**ÊLIH -** BDP'a Êlihê encama referandûma 12'ê îlonê bi civînekê nirxand. Di civînê da Hevserokê BDP'a Êlihê Şehmus Aslan, ji ber ku gelê Êlihê di referandûmê de ji sedî 60 boykot derxist spasdarî li gelê Êlihê kir û xwest ku piştgiriyê bidin xebatên TZPKurdî ya boykotkirina dibistanê.

BDP'a Êlih'ê encama referanduma 12'ê îlonê bi beşdariya rêxistinên sivîl û rêvebirên BDP'ê li salona Konferansê ya Şaredariyê bi civînekê nirxandin. Di civînê de Hevserokên BDP'a Êlihê Saadet Becerîklî, Şehmus Aslan, cîgirê Şaredariyê Serhat Temel, Serokê Meclisa Giştî Salih Aktan, rêxistinên civakî ên sivîl û gelek kes beşdarbûn. Hevserokê BDP'a Êlihê Sehmus Aslan, di civînê de axivî, anî ziman ku li gel hemû zext û zordariyan gelê wan neçûne ser sindoqan ev tiştkî watedar e û wiha got: "Em ji ber vê yekê ji gelê Êlihê re spasdariya xwe dikin." Aslan, diyar kir ku ew wekî rêxistina BDP'ê piştgirî bidin xebata TZPKurdî ya boykotkirina dibistanan a ku dê di 19'ê îlonê de dest pê bikine û xwest ku hemû gel beşdarî boykotkirina dibistanan bibe.

Piştî boykotkirina referandumê, TZPKurdî jî diyar kir ku ew dê di 19'ê îlonê de starta boykotkirina dibistanan bidin. Piştî nirxadinên ku di civînê da hatin kirin, şahiyiyên boykotkirina dibistanan wiha hatin rêzkirin: "19 îlonê de li ber avahiya şaredariyê heta kolana hûnerê dê meşekê li lidarxin. Di hemû bildboardan û taxan daleqandina afîşan, belavkirina belavokan, ji 20 îlonê heta 25'ê îlonê her roj li ber dibistanan malbat û zarok kombibin û neçin dibistanê, dibistanê boykot bikin.



## 10 hezar kesî 'Muzeya Şermê' ziyaret kir

**ENQERE -** "Muzeya Şermê" ya mexdûrên darbeya 12'ê Îlonê ku li Enqereyê hatibû vekirin di nava 10 rojan de ji aliyê 10 hezaran kesî ve hate ziyaretkirin. Biranînên kesên hatin kuştin, darvekirin û rastî işkenceyê hatin li muzeyê hatin pêşandan.

Muzeya li Navenda Hûnerên Herdem a ayîdî Şaredariya Çankayayê di navbera 3-15 îlonê hate vekirin û muze 12 rojan vekirî ma. 10 hezar kesî muze ziyaret kir. Di muzeya hate çêkirin de kesên muzeyê ziyaret dikirin sîmgeya darbeyê ya sêdarê pêşwazî dikirin. Di koşeya rumetê de wêneyên Zîlan, Erdal Eren, Kemal Pîr û hezaran şoreşgeran hatin daliqandin. Şoregerên kurd û tirk bi hemû êş kederan hatin cem hev. Qatekî din a muzeyê jî amûrên îşkenceyê mêvanan pêşwazî kirin. Feleqe, askiya fîlîstin, ceyran, tekerlek, şîşeya kolayê. Kesên ew dem jiyên rondikên xwe negirtin. Wêneyên dayikên zarokên rastî îşkenceyan hatine cih girtin. Serokê Federasyona Şoreşgerên 78'an a Enqereyê Huseyîn Esenturk, têkildarî muzeyê de agahî dan û diyar kir ku muzeyê eleqeyekî mezin dit û kesê hatin bi rondîkan rêkirine.



www.arsivakurd.org

# Navnîşan Ocalan e

Ahtîsaarî li Amedê bi siyasetmaderên kurd re hevdîtin pêk anî. Ahtîsaarî diyar kir ku divê ji bo çareseriyê bi PKK û Abdullah Ocalan re diyalog pêk bê

İsmet KAYHAN / AMED - ANF

Marttî Ahtîsaarî heta niha navbeynkariya gelek pirsgirêkan kiriye li Amedê bi siyasetmedarên kurd re hevdîtinîn pêk anî û anî ziman ku divê kurd bi hev re tevbigerin û diyar kir ku divê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd divê PKK û Abdullah Ocalan re diyalog pêk bê.

Serokê Koma Aqilmendan xwediyê Xelata Nobelê û serokomarê Fînlandiyayê yê berê Marttî Ahtîsaarî li Amedê hevserokên KCD'ê Ahmet Turk û Aysel Tugluk û Osman Baydemîr re hevdîtin pêk anî.

Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin Ahtîsaarî di hevdîtinan de ev peyam dane;

✓ Li Tirkiyeyê pirsgirêka herî girîng pirsgirêka kurd e û her wiha ev pirsgirêka demokrasiyê ye.

✓ Tirkiye heta pirsgirêka kurd çareser neke nikare bikeve Yekitiya Ewropayê.

✓ Pêvajoyên muzakereyan zehmet in lê ji bo ku Tirkiye pirsgirêkê çareser bike xwedî tecrube û agahiyên têr in.

✓ Ji bo pirsgirêka kurd çareser bibe dikarin bi PKK û Abdullah Ocalan re diyalog pêk bînin.

✓ Ji bo çareseriyê divê kurd bi hev re tevbigerin.

Ji hev parçebûn çareseriyê zehmetir dike. Weqfa Civaka Vekirî diyar kir ku hevdîtinên Marttî Ahtîsaarî yên Amedê ji bo navbeynkariyê nîn e. Weqfê da zanîn ku der barê hevdîtinên heyetê dê bê parvekirin û ev ê bandorê rapora Tirkiyeyê ya 3'emîn bike. Wisa tê texmînkirin ku heyetê bi serokomar Abdullah Gul, serokwezîr Recep Tayîp Erdogan û wezîrê Karê Derve Ahmet Davutoglu û serokê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglu re jî hevdîtinê pêk bîne.



## Turk: Bawerî bê dayîn dê çek ji dewreyê derkevin

AMED - Heyeta "Komîsyona Aqilmendan a di serokatiya Serokomarê berê yê Fînlandiya Marttî Ahtîsaarî de hatin Amedê bi Hevserokên KCD'ê Ahmet Turk û Aysel Tugluk re hevdîtin çêkirin. Turk piştî hevdîtinê diyar kir ku ger bawerî bê dayîn dê çek ji dewreyê derkevin.

Di heyata "Kosmîsyona Aqilmendan" de ji bilî Ahtîsaarî Raportorê Komîsyon û Musteşarê Wezîrê Karên Derva yê berê yê Avusturyayê Albert Rohan, Endamê Komîsyonê û Wezîrê Karên Derva yê berê yê Îspanyayê Marce Îno Oreja Aguirre, Şewirmendê taybet yê Martî Ahtîsaarî Rikka Marjamakî û Sekretera Giştî ya Waqfa Civaka Vekirî Gokçe Tuyluoglu cih girtin. Heyetê, Waliyê Amedê Mustafa Toprak Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê saziyên sivîl û piştre jî Hevserokên KCD'ê Ahmet Turk û Aysel Tugluk ziyaret kir. Piştî hevdîtina ku nêzî 2 saetan domand Hevserokê KCD'ê Ahmet Turk der barê hevdîtinê de nerînên xwe anîn ziman.

Turk, anî ziman ku dewlet jî û PKK jî dizane pirsgirêk bi çekan çareser nabe û wiha axivî: "Em ji bo çekan bê deng bikin diaxivîn. Em dê çawa karibin çekan bêdeng bikin. Em dê çawa karibin pirsgirêkê bê çek çareser bikin me nîqaş kir. Nerîna ku êdî li xêncî rêbaza çekan, bi rêbaza diyalog û muzekereyê pirsgirêk çareser bibe li hemû cîhanê serdest e û tê parastin. Dewlet jî dizane û PKK jî zane ku êdî pirsgirêk bi çekan çareser nabe. Ji ber vê yekê PKK'ê biryara bêçalakîtiyê îlan kir. Lê dewlet hêj operasyonan didomîne. Ger ku bi vî rengî pêşketin çêbibe pirsgirêk çareser nabe. Divê dewlet jî operasyonan bi dawî bike û baweriyekê bide. Ji bo vê yekê jî tenê peywir nakeve ser siyasetmedarên kurd û gelê kurd. Peywir dikeve ser milê hemû aştîxwaz û demokratan." Turk, anî ziman ku 20'ê îlonê ji bo wan gelek girîng e û ji bo pêvajoya aştiyê dirêj bibe divê dewlet û hikûmet gavan biavêje. Di vê pêvajoyê de divê hemû sazî, rêxistin û komele ji bo pêşketina aştiyê têikoşin. Em her tim bawer dikin ku dê pirsgirêk bi riya aştî û demokrasiyê çareser bibe."

## BDP dê doza Temîzoz bişopîne

AMED - Hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak dê ligel endamên MYK'ê yên BDP'ê doza Cemal Temîzoz bişopînin.

Danişîna doza JÎTEM'ê ku Fermandarê Alaya Kayseriyê û Fermandarê Koma JÎTEM'ê Cemal Temîzoz, Sercerdevan Kamîl Atak jî di nav de 7 bersûcên ji 52 kesên li Cizîrê di salên 1993-95'an de hatin kuştin tên darizandin, dê sibê li 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê bê dîtin.

Hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak dê ligel endamên MYK'ê yên BDP'ê doza Cemal Temîzoz bişopînin.

Di îdianameya Dozgeriya Komarê ya Amedê de bersûç li gorî xala 765'an a TCK'ê bi "Mirov kuştinê" "Sûckirin" û "Mirov dane kuştin" têne tawanbarkirin.

Dî îdianameyê de ji bo Cemal Temîzoz 9, Kamîl Atak 7, Temer Atak 2, Adem Yakin 7, Hidir Altug 3, Firat Altin (Abdulhakîm Guven) 6 û Kukel Atak jî carekê cezayê muebetê yê hatiye girankirin tê xwestin.




## Bersiva bêçalakîtiyê xwestin

Di 39'emîn hefteya çalakiya "Pêncşema Reş" de li Amed, Êlih, Şirnex, Mêrdîn, Riha û Îdirê dîsa girtina şaredar û siyasetmedarên kurd hatin şermezarkirin. Di çalakiyan de hate xwestin ku hikûmet bersîvê bide bêçalakîtiyê û operasyon bi dawî bibin.

*PEYAS:* Di çarçoveya "Pêncşema Reş" de 39'emîn hefteya çalakiya rûniştinê pêk hat. Di çalakiya ku li ber avahiya Şaredariya Peyasê pêk hat û endamên Meclisa Şaredariya Peyasê û nûnerên saziyên cevakî yên sivîl jî beşdar bûn de girtina şaredar û siyasetmedarên kurd hatin şermezarkirin. Di çalakiyê de hat xwestin ku hikûmet beriya 20'ê îlonê gavên çareseriyê bavêje.

*ÊLIH:* Bi heman armancê endam û nûnerên saziyên sivîl, endamên Meclisa Şaredariyê û karkerên şaredariyê li ber avahiya Şaredariya Êlihê pankartên "Di hefteya 39'an de hêj vîna me girtî ye", "Ji bo aştiya civakî muzakereya civakî", û "Em vîna xwe dixwazin vîna me nayê kelepçekirin" vekirin. Komê xwest hikûmet dawî li operasyonan bîne û beriya 20'ê îlonê gavên aştiyê bavêje. Yakut, bal kişand ser bûyera Colemêrgê jî û diyar kir ku ev provokasyon e.

ÎDIR: Di çerçoveya çalakiya "Pêncşema Reş" de encamên referandûmê jî hatin nirxandin û hate gotin ku ne tenê Şaredarê Îdirê Nûrî Guneş hemû kesên çûne ser sandoqê hatine girtin. Çalakvanan xwest ku hemû hilbijêrên hatine girtin, bên berdan.

*QOSER:* Li ber Şaredariya Qoserê bi armanca serbest berdana şaredar û siyasetmedarên kurd çalakiya her hefte roja pençemê li dar dixin pêk hat. Çalakvanan diyar kir ku gelê kurd ji girtîgehan natirse û bila hemû siyasetmedarên kurd serbest bên berdan.

*PIRSUS:* Xebatkarên Şaredariyê bi pankarata "Dest neda vîna min" li ber şaredariyê hatin cem hev û daxuyanî dan. Çalakvanan bang li hikûmetê kir ku operasyonan bidin rawestandin û berisva PKK'ê bidin.

*WÊRANŞAR:* Ji bilî xebatkarên şaredariyê nûnerên rêxistinên sivîl ên civakî jî beşdarî daxuyaniyê bûn. Li ser navê komê Kargeriya Genel-İş'ê Hîkmet Burun, daxuyanî xwende û diyar kir ku hêj operasyon û girtin didomin. Burun xwest ku siyasetmedarên kurd demildest serbest bên berdan.




## Bila muzakere dest pê bikin

SÊRT - Rêxistinên civakî yên sivîl ên li Sêrtê civiyan, xwestin biryara bêçalakîtiyê ya PKK'ê bê bersivandin, operasyon bên rawestandin û hikûmet dest bi diyalog û muzakereyan bike.

ÎHD'a Sêrtê, Înisiyatîfa Dayikên Aştiyê, Egîtîm Sen, BES, SES, Tum Bel-Sen, DÎSK, TUHAD-FED, MEYADER, endamên meclisê şaredariyê û yên bajar, têkildarî biryara "bêçalaktiyê" ya PKK'ê ya di 20'ê îlonê dê bidawî bibe daxuyaniyek dan çapameniyê. Di daxuyaniya li ber avahiya ÎHD'a Sêrtê hat dayîn de, pankarta "Bila êdî dayik rondikan nebarînin! Em aştiyê dixwazin" vekirin dowîzên, "Pêdiviya van zarokan bi aştiyê re heye", "Pêdiviya van jinan bi aştiyê re heye", "Pêdiviya vê axê bi wekhevî, azadî û demokrasiyê heye", "Li Tirkiyeyê û cîhanê aştî. Em şer kuştin û şîdetê red dikin" jî hatin vekirin.

Li ser navê girseya dixwaze pêvajoya bêçalakîtiyê bê mayînde kirin Serokê ÎHD'a Sêrtê Zana Aksu, bi gotina "Êdî bes e, şansekî bidin aştiyê" ve dest bi axaftina xwe kir. Aksu, balkişand ser zirarên şer ên madî û manevî û destnîşan kir ku biryara bêçalakîtiyê ew hêvîdar kiriye û wiha got: "Lê di pêvajoya bêçalakitiyê de li Colemêrgê 9 HPG'î hatin kuştin. Vê bûyerê hêviyên me şikand."

Aksu, destnîşan kir ku lazim e qada siyasî ya şîdetê xera kiriye ji nûv de bê avakirin û ji bo gotin û diyalog bê serdestkirin divê operasyon bên rawestandin. Aksu wiha axivî: "Ji bo bêçalaktiyek mayînde lazim e dewlet bi lez gavan bavêje. Lazim e aştiya demokratîkkirina welat înşa bike. Lazim e agirbest ji bo berjewendiyên siyasî yên biçûk neyên heba kirin û operasyon bên rawestandin." Aksu, anî ziman ku 4 roj şûn de dê biryara bêçalaktiyê bidawî bibe û ev tişt gotin: "Lazim e beriya bidawîbûna agirbestê hikûmet bi lez gavan bavêje û dest bi xebatên muzakere û diyalogê bike."

## 'Dewlet berpirsiyarê pirsgirêka kurd e'

AMED - Seroke Odeya Muşavîrên Malî ya Amedê Mehmet Erkan Azîzoglu, xwest ku ji bo aştî pêk bê biryara bêçalakiyê ya KCK'ê bidome û operasyon bên rawestandin. Azîzoglu, diyar kir ku di warê çareseriya pirsgirêka kurd de jî berpisyar dewlet e û xwest gav bên avêtin.

Odeya Muşavîrên Malî ya Amedê, têkildarî biryara "Bêçalaktiyê" ya KCK'ê ku di 20'ê îlonê de bi dawî dibe li avahiya odeyê daxuyaniyek da çapemeniyê.

Serokê Odeyê Mehmet Erkan Azîzoglu, di destpêka axaftina xwe de encamên referandûmê nirxand û got ku piştî referandûmê derketiye holê ku civak makeqanûnek nû dixwaze. Azîzoglu, piştre balkişand ser biryara "Bêçalaktiyê" ya PKK'ê ku di 20'ê îlonê de dê bi dawî be û xwest ku ji bo aştî pêk bê biryara bêçalakîtiyê ya PKK'e bidome. Azîzoglu, diyar kir ku di warê çareseriya pirsgirêka kurd de jî berpisyar dewlet e û ji dewletê xwest ku operasyonan bide rawestandin. Azîzoglu, destnîşan kir ku ji bo çareseriyê çi bikeve ser wan ew dê bikin û ji bo vê jî dê bikevin nava hewldanan.

Azîzoglu, da zanîn ku dê der barê mijarê de, bi serokên rêxistinên AKP, BDP û CHP'ê yên Amedê re jî hevdîtina pêk bînin.

## KCD'ê ji Gul randevû girt

AMED - Daxwaza randevûyê ku ji aliyê hevserokên KCD'ê Ahmet Turk û Aysel Tugluk ve ku beriya 20'ê îlonê ji bo çek bêdeng bibin ji rayedarên dewletê hatibû xwestin ji aliyê Abdullah Gul ve hat qebûlkirin.

Kongreya Civaka Demokratîk ji bo ku biryara KCK'ê ya bêçalakîtiyê bersiv bibîne û agirbest pêk bê dê bi rayedarên dewletê re hevdîtin pêk bîne. Hate hînbûn ku serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul dê biçûya Amerîkayê lê bi boneya daxwaza randevûyê çûyîna xwe taloqî rojeke din kir. Wisa tê texmînkirin ku hevdîtan Kongreya Civaka Demokratîk û Abdullah Gul li Stenbolê pêk bê.

Her wiha nûnerên KCD'ê dê piştî vegera serokê giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglu ya Brukselê hevdîtinê pêk bîne.

Di heman demê de hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk Aysel Tugluk dê heta 20'ê îlonê wekî parêzer bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê pêk bîne.

www.arsivakurd.org

# B'Tselam: Israîl kujaran diparêze

Rêxistina Mafê Mirovan a Israîlê B'Tselam diyar kir ku Israîlê di nav çar salên dawî de 617 jê sivîl bi giştî hezar û 510 kes kuştine, lê Israîl li kujeran doz venake

**TEL AWÎW/ ANF** - Rêxistina Mafê Mirovan a Israîlê B'Tselem diyar kir ku di salên dawî de gelek filistînî ji aliyê leşkerên Israîlê ve hatine kuştin, ancax Israîlê der barê van leşkeran de lêpirsîn venekiriye û wan danerizandiye.

B'Tselam binpêkirina mafê mirovan a li ser xaka Filistînê pêk tê dişopîne.

B'Tselamê got ligel ku li ser xaka Filistînê gelek filistînî di salên dawî de ji aliyê leşkerên Israîlê ve hatine kuştin jî dadgehên Israîlê der barê van leşkerên kujer yên israîlî de doz venekir û wan danerizand.

Di rapora ji aliyê B'Tselamê de hatî amadekirin de tê diyarkirin ku di 4 salê dawî de 617 jê sivîl bi giştî hezar û 510 filistînî hatine kuştin.

Di nav vê hêjmarê de kuştiyên filistînî yên dema êrîşa Israîlê ya Şerîda Gazzeyê ya sala 2008-2009'an nîn e.

Di wê êrîşê de jî pirtirên wan sivîl, jin û zarok bi kêmanî hezar û 500 filistînî hatibû qetilkirin.

Di raporê de tê aşkerakirin ku der barê 148 bûyeran de hatiye xwestin li artêşa Israîlê lêpirsîn bê vekirin.

Ancax ji vana çend dosyayên ku der barê wan de lêpirsîn dest pê kir jî di demeke kin de dosye hatine girtin.

Serokê B'Tselamê Jessica Montell diyar dike ku artêşa Israîlê operasyonên li ser xaka Filistînê wek lêkdanên çekdarî destnîşan dike û polîsên li ser xaka Filistînê peywirên xwe yên rûtîn jî pêk tînin ji aliyê artêşa Israîlê ve wek hedefên leşkerî tên qebûlkirin û dibin hedefa êrîşên artêşa Israîlê.

Montell xwest ku herêm wek herêmeke hatiye dagirkirin bê dîtin ku Israîl bi serbestî li ser xaka Filistînê nikaribe bikeve nav hewldanên keyfî.

## Hevdîtina 2'yem jî bi dawî bû



**QUDS** - Hevdîtina 2'yem a di navbera Israîl û Filistînê de pek hat. Nûnerê taybet ê Rojhilata Navîn yê Amerîkayê George Mitchell diyar kir ku Serokwezîrê Israîlê Benyamîn Netenyahû û Lîderê Filistînê Mehmûd Ebas di hevdîtinê de mijarê herî zor û giran nîqaş kirine. Di hevdîtina 2'yem de Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê Hillary Clintonê jî cih giriye.

Mitchell destnîşan kir ku her du alî li ser mijara li Şerîa Rojava ji bo cihûyan lêkirina avahiyan berbihev hatine. Nûnerê Amerîkayê detayên berbihevhatinê aşkera nekir.

Beriya daxuyaniya Mitchell Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clinton û nûnerê Israîl û Filistînê jî bi daxuyaniyek hevpar diyar kirin ku wan di hevdîtinan de hewl daye ku mijarên esasî çareser bikin.

Clintonê piştî hevdîtinan xebatên xwe yên herêmê berdewam kir. Li Qudsê bi Serokomarê Israîlê Şîmon Peres re hevdîtin kir. Dawiya vê hevdîtinê de jî bi daxuyaniyek hat gotin ku armanca wan ev e li herêmê du dewletên xweser yên ligel hev ava bikin. Clînton di dawiya bernameya xwe de bi Qralê Urdunê Abdullah re hevdîtin pêk tîne.

# Ehmedînejad: Em ji ambargoyê natirsin

**TEHRAN** - Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad diyar kir ku pêwîstiya Îranê bi Amerîkayê nîn e û ew ji ambargoyan jî natirsin. Ehmedînejad der barê mijarê de daxuyanî da NBC'ê.

Di daxuyaniyê de li ser ambargoyê ku li dijî Îranê hatine girtin û li ser çekên nukleerî yên Îranê rawestiya. Hat diyarkirin ku hedefa rojevayiyan ew e ku ambargoyên li dijî Îranê hê girantir bikin. Ehmedînejad beradan da xwe û pesnê Îranê da û wiha pêde çû: "Dixwaze Amerîka ambargoyê sed carî jî zêde bike, heta bila ewropî jî bi giştî tevlî wê bibin dê ligel rewşeke wisa jî karibin hemû pêwîstiyên xwe bibersivînin." Ehmedînejad destnîşan kir ku pêwîstiya Îranê bi Amerîkayê nîn e. Ehmedînejad ji NY'ê xwest ku çekên Israîlê yên karin bi girseyî gel ji holê rakin kontrol bike. Ehmedînejad vebirî ku rejîma 'siyonîst' xwedî çekên nukleerî ye û gef li der û cîranê xwe dixwe.

# Li Hewlêrê dibistana Alman vebû

**HEWLER / ANF** -Li paytexta herêma Federal a Kurdistan Hewlêrê yekemîn dibistana Alman hat vekirin. Di dibistana ku xwedî piştgiriya Wezareta Karên Derve yê Almanyayê de heta niha 50 xwendekar hatine qeydkirin.

Piştî destpêka şerê Kendavê ya sala 1990'î dibistana Alman a li Bexdayê hatibû girtin. Almanyayê piştî 20 salan dibistana Alman li bijarê Hewlêrê vekir.

Di vekirina dibistanê de Wezîrê Perwerdehî yê Herêma Federal a Kurdistanê Safîn Muhsen Dîzayî û Sefîrê Almanyayê yê Hewlêrê Stefan Bantle cih girtin.

Almanya bi vekirina dibistanê dixwaze zarokên malbaten kurd yên ji Almanyayê vegeriyane di vê dibistanê de bên perwerdekirin. Dihat gotin ku zarokên demeke dirêj li Almanyayê mane û pişî hilweşîna rejîma Sedam Huseyn vegeriyana başûrê Kurdistanê tengasiya entegrasyonê dijîn û dê dibistan xizmeta entegrasyonê bike. Di dibistanê de 5 pol hene û demên pêş de li gorî pêwîstiyê pol dê lê bên zêdekirin.

Wezareta Karên Derve ya Almanyayê alîkariya xebatkar û lêçûnê dide dibistanê.

Berdevka Wazareta Karên Derve yê Almanyayê Cornelia Pieper bi daxuyaniyek diyar kir ku xebatên wan ên di vê der barê de dê bidomin.

Pieper diyar kir ku Alamanyayê heta niha 400 milyon ewro alîkarî dane dibistanê. Li hemû deverên cîhanê 135 dibisatnên Almanyayê hene.

# Li 4 kujerên Kimeriyên berê doza sûcê şer hate vekirin

**PHNOM / ANF** - Dadgeha NY'yê ya li Kamboçyayê 4 lîderê Kimeriyên Sorik ên berê ji ber sûcê şer û bi pêkanîna sûcê li dijî mirovahiyê doz hatiye vekirin.

Ji dadgerên dadgeha You Bunleng diyar kir ku ji lîderên Kimeriyên Sorik Nuon Chea jî daz vekirine. Chea di dema tevkujiya kimeriyan de wek kesê duyemîn dihat zanîn û milê rastê yê lîderê Kimeriyên Sorik Pol Pot e. Pol Pot di sala 1999'an mir.

Bi lêkolînan daneyên ku hatine bidestxistin diyar dikin ku Nuon Chea di dema tevkujiya kimeriyan de xwedî risteke mezin e.

Nuon Chea piştî efuya ku di dema hikûmeta Hu Sen ya sala 1998'a teslîm bûye. Chea diyar dike ku Kimerên Sorik gelek mirov kuştin ancax ew ne xwedî vê hêzê bûye ku pêşî li vê bigire.

Dozên derbarê Chea û Ieng Sary (84) Wezîrê Karên Derve yê berêye ye û wek kesê sêyemîn yê berpirsê Kimeriyên Sorik tê zanîn. Sary gelek kesên ku ji Kamboçyayê reviyabûn vegerandibû Kamboçyayê û ew kesbi hinceta hin sûcên bê wate hatin darizandin hin jivana an hatin bidarvekirin û ên din jî di nav 'zeviyên mirinê' de hatin kuştin. Tenduristiya Sary ji ber nexweşiya ku ji sala 2007'ê û şûn ve pê ketinî her diçe xirabtir dibe.

Her du Kimeriyên Sorik ku doz li wan hatiye vekirin jî Ieng Thirîth û Khîeu Samphan in. Ieng Thîrîth (78) hevsera Ieng Sarye û di dema Kimerên Sorik de Wezîriya Karên Civakî dikir û jina herî payedar bû. Khieu Samphan '(79) jî di rêxistina Kimerên Sorik de di nav desteya hişmendiyê de cih digirt.

Rêxistina Kimerên Sorik her çiqas wekî rêxistineke çepgir tê zanîn û wek rêxistineke sosyalîst tê lansekirin, di rastiya xwe de derketiye holê ku ne wisa ye. Ev rêxistin ji aliyê Amerîkayê ve hatiye damezrandin û ji bo pêşî li geşedana şoreşên sosyalîst ên li Asyayê bigire hatiye bikaranîn. Bi k vê rêxistinê sosyalîst ya li Asya û cîhanê gelek derbeyan xware.

Dozên li Kimerên Sorik jî hatiye vekirin gelek domdirêj in. Darizandin nêzî mirina wan dest pê dike. Ev jî gumana parastinê zêde dike. Gelek derdor divê baweriyê de ye ku NY û DYA di darizandina van kesan de bi hesab nêzîk dibin û heta niha newestine ev kes bên darizandi.

Di dema rêxistina Kimerên Sorik desthilatdar bûn (1975-1979) li Kamboçyayê bi kêmanî 2 milyon kamboçî di 'zeviyên mirênê' de hatibûn kuştin.

Wê demê Pol Pot lîder bû û der barê wî de dozhat vekirin. Pol Pot di sala 1998'an mir.




# 'Ruyê tirkan dizivire'

**BERLÎN** - Fona Marshal a Almanyayê ku navenda xwe li Amerîkayê ye li ser meylên Transatlantîk lêkolînek kir û got ku raya giştiya tirk her ku diçe meyla xwe ya li ser Rojava dadigerîne ser Rojhilat.

Li gorî vê ji sedî 20'ê tirkan diyar dikin ku hevkarên Tirkiyeyê yê elzem welatên li Rojhilata Navîn in. Rêjeya ku hevkariya bi Yekitiya Ewropayê re diparêze ji sedî 13 e.

Di lêkolînê de derketiye holê ku di sala dawî de piştgiriya ji bo YE'yê nîve nîv kêm bûye, ji bo Rojhilata Navîn jî duqat piştgirî zêdebûye.

Her wiha di nav 5 salên dawî de ji meyla ji bo endamtiya YE'yê ji nîve nîv kêmbûye û daketiye ji sedî 38'an.

Tenê ji sedî 25'ê tirkan pê bawer in ku dê rojek Tirkiye jî bibe endamê YE'yê.

Rapor vedibêje ku vê daxwaza gelê tirk pêşî li polîtîkayên karên derve yê Tirkiyeyê dibire û dê di demên pêş de zext li desthilatdariyê bike da ku hevkariya xwe pirtir bi Rojhilat re li pêş bixe.

Fona Marshal a Almanyayê bi lêkolînê nêrîna ewropiyan a li ser tirkiyeyê jî tespît dike . Li gorî vê ji çaryekê ewropiyan dixwazin Tirkiye bibe endamê YE'yê.

Li Almanya û Fransayê ev rêje ji sedî 16 ye û hikûmeta her du welatan jî bi erênî nêzî endamtiya Tirkiyeyê nabin.

Ancax nîvê welatiyên ewropî di wê baweriyê de ne ku ew bixwazin jî nexwazin jî dê rojek Tirkiye bibe endamê Yekitiya Ewropayê.

Dema pirsa gelo Tirkiye xwedî nirx û krîterên Ewropayê ye tê kirin ji sedî 58'ên ewropiyan dibêjin 'na'. Rêjeyek zêde (73) di vê baweriyê de ne ku Tirkiye ne welateke ewropî ye.

Lêkolîn li ser meyla tirkan û ewropiyan ji bo Serokdewletê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê Barack Obama jî rawestiyaye. Lêgolîn destnîşan dike ku popîlîteya Obama ya li Ewropayê zêde bûye û ya li Tirkiyeyê ji sedî 50'yî daketiye ji sedî 28'an.

Di lêkolînê de pirsa nukleera Îranê jî tê kirin û nêrîna aliyan a li ser vê mijarê jî derdixe holê. Li Ewropa û Amerîkayê her 5 kesan 4 kes ji Îraneke bi nukleer fikaran dike û ancax di nav tirkan de ev rêje ji sedî 39 e.

Ji sedî 75"ê amerîkiyan, ji sedî 43'yê ewropiyan êrîşa çekdarî ya li dijî Îranê wekî rêbaza herî dawî destnîşan dikin. Li Tirkiyeyê ji sedî 13'yê tirkan êrîşa çekdarî ya li dijî Îranê rêbaza herî dawî ya çekdarî destnîşan dike.

Li gel van anketan jî rayedarên Amerîkayê diyar dikin ku têkiliyên Tirkiye û Amerîkayê li ser berjewendiyan hatiye avakirin û raya giştî nexwaze jî ev hevkarî li ser vê xetê dê bê meşandin

# Talîbanê boykot kir

**QABÎL** - Talîbanê li Afganistanê banga boykotê kir. Hat gotin ku hilbijartina roja şemiyê boykot dikin û li dijî dagirkeran êrîşên xwe gur dikin. Talîbanê di daxuyaniyê de xwest li dijî biyaniyan têkoşîn bê berzkirin û hemû hewldanên wan ên li Afganistanê pûç bê derxistin. Talîban hilbijartinên giştî qebûl nake û wek lîstikên hêzên biyanî destnîşan dike û dibêje ew dê bi boykotê û gurkirina êrîşan vê dek û dolaba welatên biyanî pûç derxin.

# BÎRANÎN



Gulistan Beştaş
(Bêrivan Cûdî)
2008 - Rojhilat

*Hîna dinalim.*
*Li benda te me.*
*Hîna lal im.*
*Zimanê min nagere... girane!..*
*Em li benda te ne...*
*Û ez li te digerim.*
***EM TE BI BÎR TÎNIN!***

**Li ser navê malbatê bavê wî Xêredîn û diya wî Cewahir**

www.arsivakurdi.org

# Şaredariyên kurd li dijî şîdetê bêtavîz tevdigerin

Şaredariya Sûrê, xala 93'yemîn a peyama kar a tomarî ku dibêje 'Mêrê tundiyê li hemberî hevsera xwe bikartîne dê sedî 50 mehaneya wî bê birîn û dê bidin hevsera wî'



AMED / DÎHA -Şaredariya Sûrê ya Amedê, xala 93'yemîn ya peyama kar a tomarî ku dibêje "Kesên tundiyê li hemberî hevsera xwe bikartîne dê sedî 50 mehaneya wî bê birîn û dê ji hevsera wî rê bê dayîn." ku bi Belediye Îş'ê re hatibû îmzekirin, xist dewreyê. Şaredariyê, li gorî vê xalê ji sedî 50 mehaneyên 6 xebatkarên ku li hemberi hevserên xwe tundî bikaranîne jê birî û da hevserên wan.

Şaredariya Sûrê, xala 93'emîn ya peyama kar a tomarî ku dibêje "Kesên tundiyê li hemberî hevsera xwe bikartîne dê sedî 50 mehaneya wî bê birîn û dê ji hevsera wî rê bê dayîn." ku bi Belediye Îş'ê re hatibû îmzekirin, xiste dewrê. Şaredariyê, li gorî vê xalê sedî 50 mehaneyên 6 xebatkarên ku li hemberî hevserên xwe tundî bikar anîne jê birî û da hevserên wan. Serokê Sendîkaya Belediye Îş'a Amedê Vezîr Perîşan, destnîşan kir ku şaredariyên Sûr û Yenîşehîrê ji ber ku xebatakarên wan li hemberî hevserên xwe tundî bi kar anîne, xala mijara gotinê bikaranîne û wiha got: "Em li hemberî tundiya li dijî zarok û jinan in. Her çiqasî rewşek hiqûqî nebe jî ramanek wiha ya sendîqa û şaredariya me heye."

**Dê vê xalê berfirehtir bikin**

Cîgira Şaredarê Sûrê Gulbahar Ormek jî, diyar kir ku 6 personelên wan ketine rewşek wiha û bi lêv kir ku ew cardin naxwazin tiştên wiha bên jiyîn. Ormek wiha axivî: "Em dê heta 2011'an vê peymanê bidomînin. Piştre jî dîsa em dê nû bikin û mirov dikare vê xalê hîn berfirehtir bike."

Xalên din ên derbarî mafên jinan de ku di peymana navbera Şaredariya Sûrê û Sendîkaya Belediye Îş'ê de hatiye îmzekirin wiha ne: "Xebatkarên li hemberî hevser û zarokên xwe tundî, bi kar bînin, mehaneya wan ji sedî 50 ji hevserên wan re tê dayîn. Alîkariya zayînê ji bo hevserên wan tên dayîn. Di dema xebatkar îstîfa bike jî pereyên bên dayîn jî bi tazmînata qidemê dê ji bo hevseran bê dayîn. Ên zewaca zêde kirine tiştên civakî yên bigrin û tazmîna kidem ji bo hevserên wan tên dayîn."

## Hejmara întiharê zêde dibe



AMED / DÎHA – Li navçeya Farqîna Amedê hate îdia kirin ku keça bi navê S.K. ya 16 salî bi demançeya bavê xwe întihar kiriye. Li Farqînê di nava 10 mehên dawî de hejmara jinên întihar kirine derket 5'an. Koordînatora Navenda Şêwirmendiya Jinan a Meyayê Refîka Akkuş, der barê îdiayên jinên întihar dikin de got ku îhtimalek mezin e ku ev kuştinên jinan e. Li bajaroka Sêdeknê ya girêdayî navçeya Farqîna Amedê, hat îdiakirin ku zaroka bi navê S.K a 16 salî di 13'ê îlonê de bi demançeya bavê xwe întihar kir. Bi întihara S.K. re hejmara jinên di nava 10 mehan de li Farqînê întihar kirine derket 5'an û li ser saziyên jinan jî destnîşan dikin ku întihar cînayet in.

Koordînatora Navenda Şêwirmendiya Jinan a Meya ya girêdayî Şaredariya Farqînê Refîka Akkuş ku întîharên jinan lêkolîn dike, diyar kir ku cînayetên tên jiyîn wekî întiharê tên nîşandan. Akkuş, anî ziman ku jinên ciwan beraliyê întîharê tên kirin û sedema vê yekê jî wekî pêkutiya civakê destnîşan kir.

Akkuş, da zanîn ku rêzefilmîn çapamenî nîşan dide bandorên mezin li ser ciwan çêdike û wiha axivî: "Bandorên mezin ên li ser keçên me yên ciwan heye. Bi taybetî lazime malbat di demên gihîştinê de pêkutiyan li ser wan nemîşinin. Di van mijaran de lazime dewlet hêstiyar nêzîk bibin."

## Li Rojhilat şîdeta li hemberî jinan her diçe zêde dibe

ÎLAM - Li rojhilatê Kurdistanê şîdeta li dijî jinan her ku diçe zêde dibe. Rejîma Îranê ku tu tedbîran nagire, li bajarên rojhilatê Kurdistanê di hefteyekê de 5 jin agir berdan canê xwe.

Li gorî malpera nûçeya malpera Harana pêr êvarê Nexşîn Xanî ya ji bajarê bajarê Ciwanro ya rojhilatê Kurdistanê ji ber pirsgirêka civakî agir berda canê xwe û di encamê de jiyana xwe ji dest da.

Her wiha 2 rojan berî niha keçeke ciwan ya kurd bi navê Şîlan xelkê Cûcesayî ya Merîwanê ji ber pirsgirêkeke civakî agir berda canê xwe û dawî li jiyana xwe anî.

Her wiha çend rojan berî niha li bajarî Îlamê jî 3 keçan bi şewitandinê, jiyana xwe bi dawî anîn.

## Di siyaseta Swêdê de jinên kurd zêde dibin



STOCKHOLM - Di hilbijartinên giştî yên Swêdê de, tişta berbiçav ji bo kurdan tê xuya kirin, zêdebûna jinên kurd ku beşdarî siyasetê bûne ye. Derfeta ku sîstema Swêdê dide jinan û riyên li ber wan vedike, dibe sedema ku gelek jin beşdarî siyasetê bibin. Hejmara jinên kurd jî di vê qadê de êdî ne hindike, hem ji bo parlamentoyê hem ji bo şaredariyan gelek berendam hene. Yek ji van jinan jî Zozan Baransson e.

Zozan Baransson a ku di 1981'an de li bajarê Mêrdînê, li gundê Girêmîra, ku girêdayî Nisêbînê ye, hatiye dinê, hîna di pênc saliya xwe de bi malbata xwe re wek penaber hatiye Swêdê. Baransson wek berendama Partiya Sosyal Demokrat li bajarê Orebro beşdarî hilbijartinan dibe. Zozan xanim li zanîngeha Malmo beşa Siyaseta Navnetewî xwendiye û mastera xwe li ser 'Aştî û Şer' amade kiriye. Piştî vê salekê li Stockholmê rojnamegerî xwendiye û demekê li bajarê Karlskoga di rojname û radyoya Swêdiyan de kar kiriye.

Zozan Xanim herî pir li ser rewşa ciwanan disekine û dibeje "ji ber ku ez jî ciwanek im û rewşa ciwanan baş fam dikim: yek meseleya bêkariyê ji bo wan gelek pêwiste, ya din jî rewşa wan a psîkolojîk girîng e. Loma dirûşma min 'Ez nikarim zêdetir rawestim ji bo karbidestxistina ciwanan. Mafê herkesî heye ku bibin xwedî kar" e.

Baransson sedema beşdarbûna xwe ya nav siyasetê wiha tîne ziman: "Ne ku em beşdarî siyasetê bûne. Ji zarokatî de siyaset li pey me hatiye. Pir neheqî li netewa me û civaka me bûye, dîroka netewa me bi neheqiyan tije ye. Dagirkerên welatê me bi şîdetê siyaset ferî me kirin. Lê ez niha wek keçeke kurd xwe mecbûr dibînim siyaseteke bi rûmet bidim meşandin û feydeyê bidim gelê xwe. Ev mecbûriyetek e ji bo me ciwanan ku em li Ewrûpa mafê netewa xwe biparêzin û wan baş bidin nasîn.

Zozan Baransson hêvîdar e ku 6000 hezar deng bistîne û wek nunereke Kurd li Parlamentoya Swêdê pirsgirêkên netewa xwe bixe rojeva civaka Swêdê û Ewrûpayê.

## Avakirina kesayetê

Hêvî Berwarî



hberwari@hotmail.com

Pir caran di nava civatan de behsa kesayetê tê kirin. Bi taybet kesayeta jinê, piranî li wê bawer in ku jina rojava serkeftî û xwedî kesayetek bihêz e, lê ligel vê jina rojhilatî berovajî vê tê dîtin, bi vî awayî pir rexne li jina rojhilatî bitaybet li jina kurd tê kirin ku kesayeta wê zeîf e.

Dibe ev dîtin rast be, lê pêwîst e sedemên wê xala zeîf bizanin paşê hind mafan bidin wan jî.

Wekî tê zanîn civaka Rojhilata Navîn bi giştî civakek hêjî feodal e. Bi çavekî sivik li jinê tê nêrtin. Ji dema dibêjin xwedê keçek da filan kesî bi tirs ve bersivê didin bavê wê.

Di ser hindê re dibêjinê bibuhire ev îradeya xwedê ye. Wisa dibêjin her wekî nûçeyê mirinekê digihînin, bi şêweyekî her wekî çi mirov zêde nebûn û xwedê ruhek nedaye tevdigerin? Lê dema xwedê lawikekî bide dê jin bi keyf û tilîlî ve biçin ka dê kî mizgîniyê digihîne da xelatekê baş werbigire.

Bêguman ev reftare xala yekem e di civaka me de ji bo avakirna kesayetê, her li ser vî bingehî kesayetî tê avakirin, keç li ser van bîr û baweran bi tirs radibe û rûdinê, bi tirs û şerm karê xwe dike û ji her tiştê li derdora xwe ditirse, bi awayekî li wê baweriyê her weke xwedê ev ferman e.

Ji bo wê daye û dibe ta ku mirinê pêgiriyê bi wê koletiyê bike ku her xizmetekê bi tirs û şerm bike.

Nabe şaşiyekê bike, nabe tiştekî bişkîne, dîsa nabe bikeve. Ji ber çarçovekirina îradeya wê ev tişt bi wê re mezin dibin û di dirêjiya jiyana wê de dibin pirsgirêk ku ji her tiştî di jiyanê de bitirse ger mêr li cem wê nebe.

Wateya wê mêr xwedî hêz û îrade ye ji ber ku serbest û azad ji dayik bûye.

Pir caran bavê av ji keçê xwestiyê bi şêweyêkê wiha tund jê re gotiye, keçê ji tirsan destên wê lerizîne û ava wê hatiye rijandin.

Dîsa ji aliyê bavê ve hatiye lêdan. Mînak bi hezaran hene, lewma ger mirov behsa kesayetê bike pêwîst e bê lêkolînkirin.

Li ser jiyana wê lêkolîn bê kirin, ka bi çi awayî hatiye perwerdekirin, perwerdekirina rast û durist xala herî bingehîn e, ji bo avakirina kesayeta her kesî çi jin an mêr, ta niha bi sedan jinên me tên kuştin û xwe dişewitînin.

Hê jî em behsa kesayetê dikin, lewma ger em bixwazin kesayetek nû biafirînin pêwîst e em ji sifrê dest pê bikin.

## Li Mehmûdî cezayê bidarvekirinê birîn

URMIYE - Rejîma Komara Îslamî ya Îranê cezayê bidarvekirinê da jineke din a kurd. Li gorî çavkaniyên herêmî, rejîma Îranê cezayê bidarvekirinê daye jina kurd a bi nave Mohêbet Mehmûdî ya di Girtîgeha Urmiyeyê de tê ragirtin.

Hat ragihandin ku Mohêbet Mehmûdî ya di girtîgeha Urmiyeyê de nameyek ji Rêxistina Mafê mirovan ya Kurdistanê re şandiye û diyar kiriye ku cezayê bi darvekirinê li wê hatiye birîn. Hat diyarkirin ku Mehmûdî daxwaza parêzerek kiriye û ji rêxistinên mafê mirovan xwestiye ku ji bo berdana wê bikevin liv û tevgerê.

Bi hinceta ku Mohêbet Mehmûdî di sala 2000'î de zilamê ku dixwest dest biavêje wê kuştiye hatibû girtin. Ev demek dirêj e di girtîgeha Urmiyeyê de ye. Hat ragihandin ku Dadgeha Bilind piştî 9 salan cezayê bidarvekirinê daye Mehmûdî.

www.arsivakurdi.org

# Rista ziman



Feratê DENGIZÎ

Ji ber ku ziman jiyan e û çand jî berdewama jiyanê ye, dixwazim di vî warî de tiştinan bi kinayî û bi rêza risteyan derbikim.

**Ziman û girîngiya zimanî**

Ji Konfiçyûs re gotine, "tu rojekê bibî keya, dê karê te yê pêşin çi be?" Gotiye; "Pêşîn ez ê ziman sererast bikim. Ji bo hevrastfêhmkirinê…"

Ziman ewqasî girîng e; ne tenê hevdufêhmkirina mirovan e ziman, ne tenê navgîna hevfêhmkirinê ye; raman, hîs, lênerîn û şiroveya jiyanê, hêviyên ji jiyanê û jiyana mirov e ziman.

Dîsa di werarê (evrîm) de raman û ziman hemandem in; yek ne berî yekî ye. Belkî jî ziman ê pêşîn e.

Di jiyanê de rista zimanî jiyanî ye.

Hilbet di qirkirinan de û di ya çandî de jî…

**Mêtingerî**

Wexta ku gelek ji aliyê mêtingeran ve bi qirkirina fîzîkî ji holê ranebe; qirkirina çandî dixin dewreyê û pêşî qedexekirina zimanî.

Rewşa ermenî, suryanî, êzîdiyan û hwd. tê zanîn. Yên ku qewirandin û yên ku kêm û bêdeng kirin.

Rewşa me kurdan: Bi qirkirina fîzîkî û bi qewirandinê meseleya me wek ku wan dixwest, çareser nedibû. Erdnîgariyeke fireh, gelekî qedîm î kevnare û bi hejmarê pir zêde. Ne bes e li çar welatan parçebûyî û koçberî jî tiştekî din. Çare ma înkar, îmha û di dema dirêj de bişaftin, bi qedexekirina zimên qirkirin. Qirkirina çandî, civakî û siyasî.

Erê, bîstûneh caran qirkirina fîzîkî û encam; xerabûna derûniya me û pedgojiyeke jixwefedîkirinê!

Pedogojiya bindestan; aşiqiya serdestên xwe û çanda wan; aşiqiya çanda tirk, ereb, îngilîz, amerîka, ewrûpayiyan û hrw…

Xwebiçûkdîtin, jiberxwefedîkirin.

Piştî valakirina gundan, rewşa kurdên ku hatine bajaran; dayik û pîr û kal… Tev berê wan li tirkî. Bi ser sefîliyê de jixwerevîn pir zêde…

Dîsa jî em naqedin, em dê neqedin û qirnebin, lê hişyarî û hişmendî divêt e.

**Qirkirin**

Rêbazên qirkirina çandî bi qedexekirina kurdî destpêdike, lewre ziman mifteha vê û ya her tiştî ye. Bişaftin û xwebişaftin (Asîmîlasyon û Otoasîmilasyon) xistin dewreyê, nebû.

Li warê serhildanan; piştî qirkirina fîzîkî rewşa pişaftin û xwepişaftinê jî me re pir xedar bû.

Em bûn "Dehwedaro di ber xelkê de" Fîdayiyê xelkê, yên biyaniyan; Alayên Hemîdî- Cerdevanî- TRT6- Z.Artûklî, mîhrîcanên dewletê yên F. Teyran- E. Xanî…Rewşa qaşo rewşenbîran… Mesele dirêj e.

Mînakên Dêrsim, Serhed, Malbata Şêx Seîd, Kamuran Înan û hwd. Piştî serhildanan ku qirkirina fîzîkî pêk hat, ji xeynî mînakên hêja, yên ku ji ber şûr, ji ber mirinê filitîn û neviyên wan tev asîmîle bûn, bûn neyarê kesayeta xwe, neyarên qewmê xwe.

Dor hat ser navên mirov û derûdoran. Nebêjin, "ma çi ye?" bandora navan pir e. Hiş diguhere, dişo û ji xwe dûr dixe. Yanî, **dims û pekmez** fark eder!!!

Zîlan çi tîne bîra we tirkan? Xecê çi di mêjiyê we de disihirîne Hatice ? Xebat xweş e yan Tarkan? Mizgîn we çawa hestiyar dike, lê Mujde ? Mirov dikare bidomîne: Gernas – Kaan / Jîr- Furkan…

Çend mînakên din: Qerqelî (Ozalp)- Westan (Gevaş)- Xweşav-Xoşav (Hoşap)- Weşûkanî (Ceylanpinar)-Axreşkê (Akresta)- Girherîn (Gulharîn)-Amed (Diyarbekir- Diyarbakir)

Heskîf (Hasankeyf)- Geliyê Gurdilan, Gurdila (Kurtalanı-Kurtalan-Misirc?)

Nav ji hişmendiyê û dîrokê re pir girîng in…

Qutkirina, qutbûna ji dîrokê, ji jiyanê ya navên biyanî…

Valakirin û şûştina binhiş e…

Jixwedûrbûn e! Biyanîbûna xwe ye! Kesayeta binketî û bi pîne ye..

Rista zimên girîng e… Li hember qirkirina çandî, siyasî, fîzîkî û ya bi her awayî; em li ber xwe bidin. Wek makezagona ku tiştek ji me re tê de tuneye, di guherîna wê de jî; em **boykot** bikin.

**Qedexekirina zimanî kuştina mirov e, qetlîam e, qirkirin e…**

Bêheq rojnameyên bi zimanê me **"Azadiya Welat"** û **"Rojev"**ê digirin. Ew dizanin çi dikin.

Lê em!?

Em **"Azadiya"** xwe, **"Welatê"** xwe û **"Azadiya Welat"**ê xwe dixwazin…

# Nirxên bingehîn ên sîstema perwerde û hîndekariya bi kurdî*

Berî her tiştî mirov bersiva pirsa : Gelo mirov dixwaze civakeka ji mirovên çawan pêkhatî ava bike, bide. Bersivên vê pirsê bingehên sîstemeka yên felsefîk, siyasî û civakî pêk tînin

HAYDAR DILJEN

Heta niha li Amedê gelek civînên li ser perwerde, ziman û çandê hatin lidarxistin. Ez bi xwe jî beşdarî wan civînan bûm. Lê ev komxebat bi du aliyên xwe ji yên din cudatir e. Ji wan yek. Siyasetmedar jî di nav me de ne. Tiştên ku li vir hatin û dê bên axaftin, encamên ku derkevin holê dê siyasetmedarên me di warê siyasî de sûdê jê werbigirin û bişopînin ku têkevin jiyanê. Pirsa perwerdehiyê, pirseke siyasî ye û jê re gavên siyasî divên. Loma beşdariya siyasetmedaran girîng e.

Ji aliyê din ve em îro êdî behsa girîngiya mafê perwerdeya bi kurdî nakin. Ji ber ku ev yek ji bo me gelek eşkere ye, me ew qonax li dû xwe hişt, em niha behsa bi rêxistinkirin û bicihanîna vî mafî dikin (...).

Ez hêvîdar im di vê komxebatê de bingehên ahengeke bikêrhatî ya di navbera tevgera siyasî û ya ziman û perwerdehiyê de bê avêtin. Loma ez nirxeke mezin didim vê komxebatê û dubare kêfxweşiya we ji bo vî karê giranbiha diyar dikim (...).




**Em sîstemeka çawa dixwazin? Divê nirxên bingehîn ên sîstema me çi bin?**

Dema ku mirov behsa perwerdeya welatekî yan jî perwerdeya bi zimanekî bike. Divê berî her tiştî mirov bersiva pirsa : **Gelo mirov dixwaze civakeka ji mirovên çawan pêkhatî ava bike**, bide. Bersivên vê pirsê bingehên sîstemeka perwerdeyê yên felsefîk, siyasî û civakî pêk tînin. Hemû sîstem li ser vê bingehê tê avakirin.

**Em dixwazin mirovên çawan bigihînin?**

- *Afirêner*
- *Xwedî berpirsiyarî*
- *Aştîxwaz*
- *Li hember cudahiyan bi tolerans*
- *Ji hêjahiyên demokrasiyê yên navneteweyî re rêzdar,*
- *Ji piştgiriya navneteweyî re vekirî*
- *Di warê mafan de wekheviya jin û mêran diparêze û di jiyana xwe de pêk tîne*
- *Bi însiyatîf û bixwebawer*
- *B i nasnameya xwe serbilind lê ji nasnameyên din re jî rêzdar*

Ji bo ku em bikaribin mirovên wiha bigihînin, divê em sîstemeka perwerdehiyê ya li ser van bingehan ava bikin:

Sîstema me, dê bi giştî li ser bingehên nirxên demokrasiyê yên navneteweyî bê avakirin.

Sîstema me, dê wek pêşdibistan, dibistan, lîse û ji bo kesên xwedî alîkariyeke taybet, ji xwendegehên taybet pêk were.

Di sîstema me de dê mirov di navendê de be. Ji pêşdibistanê heta zanîngehê, di her asta perwerdeyê de, hemû çalakiyên perwerdehiyê dê ji bo pêşvebirina mirov a civakî, çandî, zimanî, derûnî û hwd be.

Sîstema me dê ji zarokxaneyê heta zanîngehê li ser bingeha rêzgirtina destlênedana kesayetiya mirovan bê avakirin. Her weha dê sîstem li dijî her cure biçûkxistin û şovenîzmê be.

Sîstem dê di warê hişmendî û pratîkê de wekheviya jin û mêran bi pêş bixe.

Di xwendegehên me de dê her kes xwedî heman nirxê be û cawazî dê wek dewlemendî bên dîtin.

Perwerde, dê bi kurdî (kurmancû û dimilkî) be, lê dê li gor civakeka duzaravayî, pirzimanî û pirçandî bê plankirin. Ji pêşdibistanê heta zanîngehê, dê zarokên kurd, ermenî, ereb, tirk, suryanî û yên din hem bi zimanê xwe û hem jî bi zimanên hevalên xwe kêfxweş û serbilind bin.

Mafê perwerdeya zimanê kêmneteweyan dê bi qanûnê bê garantîkirin.Her kes ê xwedî mafê perwerdeya bi heman kalîteyê be. Zaravayên me, kurmancî û dimilkî, dê xwedî heman derfetên perwerdehiyê bin.

Ji avahiyên xwendegehan heta naverok û materyalên dibistanê dê ji bo kurdên siqet ên laşî û derûnî yên ku pêwîstiya wan bi alîkariyeke taybet heye îmkan bên peydakirin. Kor, ker û hwd. Dê hemû civak li gor vê yekê bê perwerdekirin.

Xizmetên dewletê û şaredariyan ên civakî dê wisan bên plankirin ku kesên xwedî alîkariyeke taybet dê bikaribin li ser lingên xwe bisekinin, bi serê xwe derkevin nav civakê û jiyana xwe berdewam bikin. Mixabin, di rewşa îro de her tişt li gor mirovên bi du ling, duçav, du guh, normal pêşketî hatiye avakirin?

Di hemû astên perwedeyê de, di hemû materyalên perwerdehiyê de ji bo mêr û jinan; keç û kuran dê heman nirx bên dayin. Ango jin û mêr dê di sîstema me de du stûnên bingehîn ên civakê ên xwedî heman mafan bin.

Dê di sîstema me de, zarokên kurd wisa bên perwerdekirin ku bi kurdbûna xwe, bi çand û zimanê xwe serbilind bin; lê di heman demê de ji bo çand û zimanên din jî rêzdar bin.

Dê dewlet û şaredarî, bi hemû saziyên xwe ve, ji bo xizmeta mirovan hebin.

**Konsepta sîstema perwerdehiyê ya welatekî**

Sîstema perwerdeyê ya welatekî yan jî neteweyekî, ji konsepteka ji gelek tiştan pêkhatî pêk tê: Wek nimûne:

Prensîbên/rêgezên perwerdehiyê

Nirxên perwerdeyê yên bingehîn

Rêveberiya perwerdeyê: wezaret û xwendegeh

Qanûn û rêzikname

Programên beşan

Planên dersê

Nirxandin

Gihandina mamosteyan

Materyalên dersê

Awayên dersdayinê

Rola dêûbavan

Avahiyên xwendegehan

Rêxistinên mamoste û şagirdan

Divê ev hemû beş an aliyên perwerdehiyê li ser nirxên bingehîn ku li jorê hatin binavkirin bên avakirin.

Ez wek gotina xwe ya dawiyê dixwazim bêjim, divê em sîstemeke wisa amade bikin ku zarok û xort, ango ciwan her roj ber bi xwendegehên xwe ve bi kêfxweşî baz bidin, ne ku ji xwendegehan birevin. Ev yek pêkan e û em bi hev re dikarin sîstemeke wiha li ser bingehên hêjahiyên mirovahiyê û destlênedana întegrîteta mirov ava bikin.

**Haydar Diljen ev teks di "Komxebata ziman û perwerdeyê ya navneteweyî" ya KCD'ê 12-13'ê hezîrana 2010'ê de pêşkêş kiribû.*



Nadîr Arzu

nadirarzu@windowslive.com

## Encamên referandûmê

Divê mirov encamên referandûmê çawa bixwîne? Piştî gelek nîqaş û aloziyan referandûma paketa AKP'ê hat û derbas bû, lê bi xwe re gelek tiştên bên nîqaşkirin ji derxist holê. Ji bo me kurdan a girîng boykot bû. Em di boykotê de li gorî rêjeyê her çiqas ne li gorî dilê me jî be, em bi serkeftin. Ev serkeftin divê kêmahiyên me yên heyîn ji ber çavan dûr nexe. Di rojhilat û başûr-bakurê Kurdistanê de ez dikarim bêjim em gihiştin armanca xwe, lê li bakur û rojavayê bakurê Kurdistanê boykot her çiqas hebe jî li gorî asta ku kurdan dixwest çênebû. Ya girîng ew e ku kurdan rêxistinbûyina xwe nîşan da ku ew êdî hêzek alî ne ku bên muxatab girtin. Hemû nivîskar û aqilmendên tirkan hêj dema encamên hilbijartinan nû aşkera dibûn ev rastî anîn ziman. Ev encam ji bo demê pêş kurd hêj baştir bên muxatab girtin encamên girîng bûn. Pêwîst e siyaseta kurd baş bikare vê encamê bikar bîne siyaseta xwe hêj hêztir û dijwartir bike.

Boykot gihîşt armanca xwe ev rastiyek mîsoger e. Erê boykot baş bû ka em ê piştî boykotê siyaseteke çawa bimeşînin ku em bikarin xweseriya demokratîk li Kurdistanê birêxistin bikin. Ya ji her tiştî lezgîntir li gorî min ev e. Hikûmeta AKP'ê ji hemû hikûmetên din ên pergalê zêdetir pêl damarê kurdan dike. Di dema borî de pergala dagirkerî li Kurdistanê wekî niha ne birêxistin bû. Niha pergalê xwe bi destê AKP û hin xwefiroşên kurdan li her cihê Kurdistanê dibin navê mislimantiyê de birêxistin kiriye. Divê siyaseta kurd vêya baş bibîne û li gorî vêya bi lezgînî dest bi xebatên avakirina xweseriya demokratîk bike.

Li gelek bajêrên Kurdistanê di referandûmê de wekî ku siyaseta kurd dixwest nehatin birêxistin kirin û tevnegeriyan. Mînak Riha, Dîlok, Semsûr, Çewlik, Meletî, Agirî, Qers, Erdehan, Ezirom, Elezîz, Dêrsim, Mûş, Bedlîs, Mereş û hwd gelek bajar di tevlîbûna xwe ya boykotê de kêm man. Divê siyaseta kurd a demokratîk bi lez û bez rêxistingeriya xwe di ber çavan re derbas bike û xebatên van bajaran xurt bike. Yan na Şoreşa Kurdistanê û xweseriya demokratîk li ser milê çend bajaran bimîne dewlet an jî pergal bi teybetî bi destê rêxistinên wekî cemaeta Fettullah Gulen û AKP'ê kurdan bi her awayî dê bixwazin bixapînin û bixin xizmeta xwe. Rojavayê bakurê Kurdistanê di aliyê boykotê de mirov dikare bêje di sinifê de ma. Ev ji bo me kêmasiyek e. Di cihek wekî Colemêrgê de ji sedî 95 naçin li ser sindoqan lê li Meletî, Dîlok, Çewlik û hwd ji sedî 70'yî zêdetir diçin ser sindoqan ma ew der jî ne bajarên Kurdistanê ne. Heta niha me digot em ê bibin partiya Tirkiyeyê bi ya min divê em destpêkê de xwe li Kurdistanê baş rêxistin bikin piştre berê xwe bidin Tirkiyeyê.

Em dikarin encama referandûmê wiha bixwînin;

*1.* Kurdan di vê referandûmê de hêza xwe nîşan da û ji dewletê re ji got ku tu bêyî me nikarî tu çareseriyê pêk bînî. Em hene û pêwîst e ku tu me bibînî, bi teybetî jî muxatabê pirsgirêkê birêz Abdullah Ocalan e. Vê rastiyê divê herkes qebûl bike.

*2.* Ji bilî boykotê dengên AKP'ê bi piranî ji bajarên kurdan bû divê hem kurd hem jî AKP vêya ji baş binirxînin. Dema AKP ji cihek wekî Amedê zêdeyî 200 hezar deng bigire divê mirov hindek pirsan ji xwe bike. Heke em ji xwe hindek pirsan nekin rêxistinên xwe di ber çavan re derbas nekin di hilbijartina pêşiya me de dibe ku listokên hêj mezintir li ser kurdan bên kirin.

*3.* CHP û MHP ji xwe li Kurdistanê qediyane niha li hemberî tevgera kurd tenê AKP heye. Ev bi xwe re xetereyan jî tîne di hilbijartinan de îhtîmal e ku ev partî dê li hemberî me wekî lîsteyeke blok derkevin, divê mirov ji niha û pêve tedbîrên vê siyaseta dewletê ya li hemberî kurdan bûye yek blok ji bibîne. Rol û mîsyona ku niha dane AKP'ê rola tasfiyekirina kurdan e. Vêya ji bi rêya din ango ev yek bikaranîna termînoloji olî dike ev ji xetereyeke mezin e ji bo tevgera kurd.

*4.* Tişta herî girîng hêza siyaseta kurd li rojava û bakurê bakurê Kurdistanê wekî ku tê xwestin nehatiye rêxistinkirin. Divê Serhed û rojavayê Kurdistanê bê bidestxistin. Lîstokên pergalê yên li ser kurdan ji wan re baş bê gotin ku bi kurdbûna xwe bi warqilin.

Bi hêviya di hilbijartinên bên de kurd serkeftinên hêj mezintir bidest bixin.

www.arsivakurdi.org

# Boykota ziwanî standarta YE wazena

**TZPKurdîy kurdan ra waşt ke wa roja 20ê îlonî ra hetanê 25an gedeyanê xo meeşrawê dibistanan. BDP paştî da boykotî. Kurdîy wazenê ke di statûya YE di mafê kurdan yê ziwnî bêro dayiş.Wa ziwanê kurdan zî bibo fermî û ziwanê wendişî**

**STENBOL - ANF** Kurdîy naray qabê ziwanê xo bigê ra boykota dibistananê tirkî kenêy. Boykot kişta TZPKurdî ra ame dest pê kerdiş. Waştişê kurdan di daxûyaney di ardî ziwanke kurdî wa di standartanê YE di ziwanê bibê warê ziwanê xo.

Tirkî 85 serro ke mafê ziwanê kurdan giroto xo destan û heqê ziwan û zenwbînan nêdanê û qedexe kerdêy. Kurdîy qabê ke mafê ziwanê xo bigê ra rayna vatî 'boykot'. Na ray zî qabê ke dibistanê dewleta Tirkîyeyî ya demsala 2010-2011 di hefta sifteyine di vazenê ke heme kesanê ke vanê ez kurda lazimo ke gedeyanê xo 20'ê îlonî ra hetanê 25'ê îlonî, yanê hewteyê merêşê dibistanan ke wa mafê ziwanê kurdî bêro dayiş û bi qanûn bibo.

Rayîrberanê dewletî lazimbi ke besiva erênî bidê eme bertekanê xo yê tehdîtwarey di mojnay. Şar di biryara boykotdayişê TZPKurdî di yew veng o û wazeno ke kurdîy di warê ziwanî di mafanê xo bi qanûn bigê. Çimkî kurdîy wazenê di çarçevoya mafanê merdiman û di waştişê YEî ya Tirkîya ra mafanê xo bigê. Û ard ziwan ke eger maf medo dayiş dê heme cayan bikî dibistananê kurdî. Çimkî goreya YE cayê di çend ziwan bibo se kes nêşeno înan qedex bikero. Heme kesîy azad êy ke kamcin ziwanê wazenê bi ey qisey bikerê.

YE, qabê ke Tirkîya bibo endamê înan şerta ziwanê tikeyan gere bêro dayiş da ver. 1992 di no peyman kişta dewletanê endamê YE ra ame destxêzkerdiş. Semedê ke koçberî zî kunê statûya tikeyan ra Tirkîya no peyman îmze nêkerd. Goreya peymana Lozanî zî lazimo ke Tirkîya destxêz bikero. Ema na gam xo tebera peymanî di dawo vindarnayiş.

**BDP paştî da Boykotî**

Şarê kurd qabê mafanê xo ra mafê ziwanî bi qanûn bikero ra devzendikanê xo hilkerdîy. TZPKurdîy di 13 îlonî di di daxûyaney eşkera kerd ke kurdîy dê akerdişê dibistananê Tirkîyayî di hewteya sifteyin wa kurdîy gedeyanê xo merêşê dibistanan û boykot bikerê. Bi ney zî waştî ke bala şar û rayîrberan boncê ziwanê makî yê kurdan sero ke bikê fermîy. Pey daxûyaney boykot veng da û partîya BDPî paştî da boykotî û qabê ke şar gedeyanê xo merêşêy dibistanî ra veng da şarî. No çî qabê amayişê boykotî zaf bi bandor bi.

**Sistema YE wina wo**

***Fransa;*** ziwanê tikeyan fermî yo û di dibistananê xoser di yeno veçînayiş.

***Almanya;*** tikeyî şikyenê cayanê fermî di bi nuştiş û bi fekî xo îfade bikerêy. Wazîyeno dibistanan, wazîyeno di medya di şikyenê ziwanê xo bikar bîarê.

***Ingilistan;*** şarê bîyanijî şikyenê çand û hunera xo di ziwanê xo di biweşnê û dibistanê teybet abikerê.

***Îtalya;*** ziwanê tikeyan ra destûr nêda. Bi dibistana verînî ya tûtan û ya seretayî mecbûrî bi îtalî, eger hewce û talep bibo tikeyî şikyenê ziwanê xo di perwerdehey di bikar bîyarê.

***Îspanya;*** di heme waran di mafê heme kesan esto ke bi ziwanê xo qisey û çîyan bikerêy.

***Yewnanistan;*** Trakyaya Rohilatî di 230 dibistanêy tirkan esto ke tirkî dano mûsyayiş. Ema tirkîya di no heq çîno.

Danîmarka, Avûsturya de mafanê ziwnan hemeyî hima hima di çarçevoya Almanya di dayê.

***Hollanda;*** 2007 di goreya weçînayişî mafanê ziwanî yê koçberan da ke çand û ziwanê xo avera biberê.

***Bulgaristan;*** heqê heme kes û koçberan esto ke biziwanê xo, xo îfade bikerêy.




# *Titûna Licê dê bibo marka*

**Ehmedê BIRA – AMED**

Zafêreya dewanê başûrê qeza Amedî Licê di, dewijî debara xo zafêrey bi çandineya titûnî kenêy. Sontaj danê erdî ro û bi ey aw danê. Donimî ra 400-500 kîlo titûn genêy.

Dewijanê Licê yê başûrê ci deyê ra zafêrey debara xo bi titûnî kenêy û aborîya Licê û aborîya xo paya danê vindarnayişî. Goreya citkaran donimê erdî ra mîyanê 400 kîlo û 500 kîlo titûn yeno wedarnayiş. Ewnîyayişê titûnî ze tûtê yo û zaf zehmet o.

Ney ra, karê heme kesan nîyo ke titûn bêro ramitiş. Zafêrey kesanê ke gedeyanê înan zaf êy daha zaf titûn ramenê û erdî ra zafê titûn genêy.

Waxta arêkerdişê pelanê ey gere nêravêro û awa ci gere kemî nêbo. Eger waxt weş meyro bikarardiş se, titûn bê qalîte beno û no zî buhayê titûnî sero neyîney dano û erzan beno.

Dewanê Licê ra Helhel, Licok, Şimşim, Entax, Sinê û yên dormeyê nînan di hemeyî titûn ramenê. Romayişê titûnî ra herî zaf, kesîy kêyanê xo erdanê xo mîyan di viraştêy, çimkî awa ke bi sontajî amewo vetiş qimê erdan û qimê kêyî kena û tengaseyan awî nîna antiş. Titûn ramitiş qeza Amedî Karaz (Kocakoy) ra dest pêy keno hetanê Licê û Hezro yî ca bi ca koyan di esto. Zafêrey zî orteyê hîrê qezayan di zaf ramîyeno. Dewijî ney titûna ke ramenê û kenê titûna şimitişî zaf êy. Ema kesanê ke roşenê karxaneyanê cigareyan zî estêy. Ney kesî zî bi belgê yê û titûna ke ramenê mecbûr benêy danê ey karxaneyan.

Titûna Licê dê bibo marka Goreya ke yeno vatiş na gam titûna Licê, na gam verê ci roşnî eyseno.

Çimkî cigareyanê ke karxaneyî virazenê zaf vayê. Ema şar qabê ke debara xo di, ney şert û mercanê zor di bikerê ra mecbûr mendêy ke titûna herî weş bîyarê meydan û biroşê.

Çend serranê bêro di, hinî eyseno ke Licê di titûn aborîya qezayî di dê cayê zaf hîra bigo û titûna licê dê dinyayî di bibo markayê. Na gam titûn zafêrey bi destûra dewletî yeno ramitiş eger na belge bêro werdarnayiş se dê haha zaf kesîy bi ramê. Zaf ramayişê titûnî dê licê di kotaya titûnî 3-4 kat zêd bikero.

Eger bêro di hal wina bibo se titûna Licê dê dinyayî di bi name bibo û bibo markayê dê herî weş.



*Titûna Licê çend serranê bêro di dê bibo marqayê. Qabê ney zî lazimo ke rayberdoxî ney bivînê û di ney çarçevoyî de verê koperatîfey di gama berzê kî, demê daha kilmî di wa bibo marqa.Kooperatîfbiyiş dê paştî bido erdanê ze Licok, Helhel û dewanê dormeyê înan û dewanê ke karê înan se Licê di titûn dê daha geş bibo.*





# Ageyrayîşê Medan

**SERHAT AMEDIJ**

Etya ra nizdê 2600 sere verê ci bi. Serê erdê Mezopotamya de împaratoreyêke bi namey Împaratoreya Medya bi.

Medî şarêke bi heybet û medenî bîy.

Medan zemanêke zehf kilm de bî vilay û erdê xo kerdî hîra. Labelê Medan nêwaştêne şaranê bînan bi zor bikerê zey xo. Îne zehftir dorverê xo de bîbî vila û serdestî kerdêne. Dima ra torinê padîşahê peynîn ê Medan torinê Astagyagesî Sîrûs ê pîlî peynî arde serdestîye Medan rê û serdestîye Axamenîşîyan da dest pê kerdîy.

Labelê Sîrusî Astagyegsî nêkiştbi û wezîfedaranê saray zî tê nêdabi û bi îne dir pîya serdestîye xo dewam kerd û erdê xo kerd hîratir.

Semedê enî zehfê dîrokzanî vanê împaratorîye Medî verê mîladî 550 de nê, labelê dimay ke Îskenderî peynî serdestîye Axamenîşîyan rê arde yanê verê zayişî 330 de qedya. Û hancî zehfê dîrokzanî hemfikirê ke Medî kalikê kurdan ê eyroyînî bîy.

Dimay Axamenîşîyan împaratorîye Selevkosî ke bi fermanê Îskenderî hamebi viraştişî hukim kerd.

Dima ra zî verê mîladî 248 de Parthîyan împaratorî viraşt û peynî împaratorîye Selevkosî rê ard.

Zehfê dîrokzanan parthîyan zey kalikanê farisanê eyroy bihesebnê zî eno zî bi awayke zanyarey hema tam nêhamewo îspatkerdişî.

Dimay împaratorîye Parthîyan verê zayişî 242 de împaratorîye Sasanî serdest bena û heya hamyayîşê Îslamîyetî zî serdestîye xo Îran de dewam kena. Dimay ke Îslamîyet yeno împaratorîye Sasanî rê peynî ano û Îran kono binê destê ereban.

Ereban verê Îranî Kurdistan kerdibî binê destê xo.

Dima ra împaratorîye Kurdan ke ma bieşkê vacê bi hawayke netewî hamîya viraştişî çinêbya heya eyro.

Dimay serdestîye ereban Kurdistan kewt binê serdestîye tirkan. Û eyro zî Kurdistan hem binê destê ereban, tirkan û hem zî binê destê farisan de wo.

Eger ma Axamenîşîyan zî dewamê Medan û kurd bihesebnê 2200 sereyo kurdî hema binê yew qatîkede nêhameyê pêser.

Bi raştî zî eno çî zehf halêke nêweşo.Semedo ke ay kalikanê ma ke zemanê xode serdestê enî erdan bî û heme kurdî bîbî yew.

Ma se bikerê bikerê ganî ma reyna serê enî erdan de bibê serdest û bibê wayîrê welatêke xo.

Ganî ma ageyrê serê ristimê xo û ma fam bikerê ma sehîn verûcû eşkawo împaratorîke rayîr ra berda, ma eyro zî eşkenê welatêke ronê û rayîr ra berê.

Bi raştî ageyrayîşê Medan eyro verê heme çimanê dinyade bica yeno. Eyro lacê Medan, lacê adir û rojî ke hes kerdişîye merdimatî xo dir ardo û risnawo heya eyro, wiştê we pay û veng danê heme Medan û vanê hurzê/werzê we û serdestîyê ke heya eyro şima ra hamî diznayîşî pey de bigêrê!

Hurzê we û heyfê cênîyan, tûtan û kalikanê şima ke tenya sûcê înan kurd bîyayîş bi û semedê enî hamey bî kiştişî bigêrê!

Hurzê we û semedo ke şima hancî zî azadane serê erdê xo de bicîwîyê şer bikerê, heya ke serê enî erdê şima de ziwanê şima bibo azad, çandê şima bibo azad û bawerîyê şima bibê azad!

Eyro roj lacê Medan ageyray û go reyna serdestîye xo destê helenan ra, farisan ra, ereban ra û tirkan ra bigêrê û go bibê serdest serê erdê xo de.

Rojê newe ra serdest bîyayîşê kurdan serê erdê xo de nizdo!

Peynî de ma goş bişanê nemir Dildarî sirûdê ey reqîb de çiqa raşt vato :

Mayê xortê Medya û Keyxusrewê

Dînê ma, ayînê ma her niştîman!

Lacê kurd wişto we payan zey şêran

Ta bi gunî nexş bikero tacê cîhan!

www.arsivakurd.org

# Lêgerîna evîneke qedexe

*Ez li te digerim*
*bi dizîka*
*ez te bi dizîka jî*
*ji mirovên bibask*
*dipirsim*
*nahêlim ku ez navê*
*te yê pîroz*
*di nava stranên xwe*
*yên evîndarî de*
*bistirêm*
*nahêlin ku ez li ser*
*xaka te*
*ji xwedavenda xwe*
*re şûjde bibim*
*de bi ahd û wahd be*
*ez ê te*
*di her peyvê de*
*bineqişînim*
*û di her hevokê de*
*bixemilînim*
*ez li te û navê te yê*
*qedexe digerim*
*Kurdîstana min a*
*rind û binefş*
*ez li ser sîng û berên*
*te*
*li navê te digerim*
*çi qasî şevên bextreş*
*li min*
*bêbextiyê bike jî*
*dîsa ez ê li te*
*bigerim*
*heta ku giyan di*
*bedena min de hebe*
*ez ê te ji pelên ewrên*
*ku*
*ber bi azadiyê ve*
*dibezin*
*bipirsim*
*ez ê te ji çiyayên ku*
*ez bi jan*
*û bi dizî zam e*
*bipirsim*
*evîna min a pîroz*
*deqa ku ez li te*
*digerim*
*şewq û tîrêjên roja*
*germ*
*ji min re dibin ronahî*
*stêrkên ku asîman bi*
*çirûsîna xwe*
*xemilandine*
*dibin hêviya dîtin*
*û gihîtina te*
*evîna min*
*ez bi sond dixwim ku*
*dê te rizgar bikim*
*û qedexebûna li ser*
*te*
*ez ê bi zincîrên bi*
*asîmanê jorîn ve girê*
*bidim*
*wê demê zarokên te*
*bi dilşadî govenda*
*azadiyê*
*li darxin li sînga te*

FEHMÎ AKINCI

# Manewiyeta rewanî cewhera civakê ye

**NEDÎM YILMAZ***

Avahiyek bi keviran bê çêkirin, cebra wan keviran bi xercê gengaz dibe. Ne xerc be, dê dêza keviran hilweşe. Bedena mirov an jî zindiyek bi goşt û hestiyê tejîgirtî, ne bi herikandina xwîna demaran, dan û standina bêhna cergê be, ew jî dê hilweşe û nejî. Ji bocivaka mirovahiyê jî rista tevna manewiyatê ne be dê hebûnekî civakî ne gengaz be û wekî dêza kevirên bê xerc her yek di hêlekî de bigindire û dê wek bedenek bê xwîn û bê bêhn li ser erdê birize. Lewra em dikarin bêjin ew civaka mirovahiyê ku aboriya wê ji her mirovekî pêk tê; xerc, xwîn û bêhna wê di cebirîne û jiyanê jê re di afirîne û dike civak, manewiyat e. Ji xwe manewiyat cewhera civakê û wesfa mirov a civakê ye.

Ev cewher; hest, raman, ajo, hîs, êş, şahî û hwd, ji razberên mirov ji destpêkê pêk tên. Xemla van razberiyan li ser tevna cewhera mirov bi amûrên wekî hezkirin, wijdan, bawerî, moral, fedîkarî û hwd. Rengên ceribandina tevna civaka mirovhiyê ya polîtîk şênber dikin; mirov bi tevgera xwe van amûran bi dest dixe, di nav hev de dixemilîne û avahiya civakê radixe ber çavan.

Ev remz û motifên manewî di civakê de çiqas xurt, zindî û jîndar bin û mirov li wan nirxan xwedî derkeve û biporize, ew qas cebra di navbera dibe, bi xweza û hawerdorê re di nava hevsengiyekê organîk de tevna jiyanek bi motîfên manewî ya li ser esasên rêgezên rêzdarî û hizkirinê bi qewî dixemilin.

Manewiyat her çiqas di kesan de teşe digire û aktorên rista vê tevna civakî yek bi yek ji kesan pêk tên, jî di rastiyê de manewiyat cewhera civakî ye. Lewra tevgerîna kesan a civakî ancax remza vê cewherê bi lêv dike û watedar dibe. Ango tevgerîna kesan a ji bona berjewendiyên civakê û mirovahiyê manewiyat e. Berpirsyarî, rêxistinî, parvekirin û parastina peywira mirov a li ber civakê ye. Ji dûrê berjewendiyên kesan yên ezotî û ezezayî ye; berjewendiyên kesan di nava berjewendiyên civakê de gengaz dibin. Çawa ku kevirek di nava diwarê xanî de xemilandî be, ew kevir hem kevirekî çêkirî yê dîwar û hem jî xalekê ji dîwêr re û wesfa dîwar li sere. Lê kevirekî li derveyî dîwar be, reng û wesfa dîwar nagire. Mirov jî wisane; mirovek di hêla nirx û wesfên manewî de çiqas perwerdekirî, kêrhatî, jêhatî û pêkhatî be, ew qas xwedî kesayetekî serbixwe û azade û ew qas kêrhatiyê civakê ye û xwedî wesfên civakê yê manewî ye.

Lewra em dikarin bibêjin ku manewiyat aqilê bedena civakê yê hevpar e; irf, adet, çand, hûner û hemû folklora civakê bi vî aqilê hevpar tê afirandin. Ev berhemên afrênerî xerca cebra civakê ye û amûrên wê yên rêxistinkirinê ne wesfên civakekê bi exlaqî û polîtîka demokratîkî bi vê aqilê ji cewhera civakek demokratîk û xwezaparêz gengaz dibe. Ev tevgeriyane xwe bi xwe ya rêxistinkirina civakê ye. Li ser van esas û rêgezan civak çiqas çiqas xwe bi rêxistin bike, ew qas guliyên tevna w êşîn tên hûnandin û ev ji dibe hêza civakekê rengazad û têra xwe kiri ye.

> Mirovek di hêla nirx û wesfên manewî de çiqas perwerdekirî, kêrhatî, jêhatî û pêkhatî be, ew qas xwedî kesayetekî serbixwe û azad e û ew qas kêrhatiyê civakê ye û xwedî wesfên civakê yê manewî ye

Lêbelê em hem ji dîroka civakê ya 5 hezar salên dawî ku di bin nîrê kedkariyê de hatiye rêvebirin, hem jî ji civaka îro tê de dijîn di zanin ku ji hêla desthilatdaran ve tevna civakê her dayim bi şûr û xenceran hatiye çirandin. Ji berjewendiyên desthilatdariya mêtinger re tehlûka herî mezin û tedar, li ser bingeh û rêgezên cewhera xwe bi hêzbûyîna civakê ye. Lewre desthilatdariyê her dayim serî li rê û rêbazên ji hev du belavekirina vê motîfa civakê daye. Çiqas kariye civakekî ji manewiyeta wê dûr, bi hêz li gorî berjewendiyên xwe re bibe.

Ji bo vê jî desthilatdariya mêtinger serî li hemû konetiyan daye. Konetiya herî mezin ev e; ku dest avêtiye hemû nirxên cewhera mirovahiyê. Yanî manewiyeta civakê deste ser kiriye, naveroka motîfên manewî li gorî berjewendiyên xwe teşe û şewaz daye û bi xapandinek mezin û derewin pêşkêşî civakê kiriye. Bi rastî desthilatdariya mêtinger di vê hêlê de endezariyekê çê, afirêner û xwedî hûner e; mirov bi cewhera wê ya civakî wisa daye biyankirin ku mirov bi 'dilxwazî' xizmeta pergala wê bikin. Tevna cewhera civakê bi destê xwe diçirinin û berepaşkî tevna derewîn bi destên xwe di hûninin. Asta mirovan di xizmeta civaka pergala kapîtalîzmê de hatiye afirandin. Vê rastiyê ji hemû serdemên dîrokê şênbertir ber bi çav dikin. Di kesan de hişmendiya manewî hatiye ji bîrkirin û dewsa wê madiyetekî li ser esasê takekesî û berjewendiyên ezezayî hatiye qeyd kirin. Çawa ku mirov mêjiyê mirov ji serê wî derxistibe û mirov di nava valetiyekî ne diyar û bê binî de hiştibe û di nava vê valehiya ne diyar de kîjan hêlê ve bixwaze bi wê hêlê wê kontrol bike û bikişine rewşa civaka ku bi navê modernîta kaptalizmê li hatiye kirin. Ev civakekê derewîna di cewherê xwe de riziya ye. Ji feleketên tevleheviyê şer û kuştiniyê pê ve tu tiştekî din xwedî nake ji pêşeroja civaka mirovahiyê re.

Lewre hewcedariyekî jî tune ye ku mirov têkoşîna rizgar bûyîna vê pergal û hişmendiya derewîn û mêtingerî bide. Di têkoşîna civakekî ehlaqî û polîtîkî ya demokratîk hûnandina tevna manewiyatê gengaz dibe. Çiqas xalên manewiyatê li ser bingeha wê benê şînkirin û jîn kirin, ev di cewhera civakê geş û jîndar bibe. Rê û rêbaz, rêgez û şêwaza serkeftina têkoşîna manewiyatê ji hêla Tevgera Azadiya Kurdistanê ve bi zelalî hatiye hûnandin. Têkoşîna Tevgera Azadiyê ya nêzî çil salan e li Kurdistanê motîfên herî rengin vê cewherê kurd de ristiye û xemilandiye.

Ev model û ceberiyekî li ber çavan ku serkeftinê ye wedî dike ji pêşeroja mirovahiyê re.

Aşkera ye hezkirin, bawerî, xîretkêşî û canfedekariya herî gewre û watedar a bê hember û berjewendiyên kesane di têkoşîna tevgera azadiyê de afiriye û di civaka Kurdistanê de wate û nûnertiya wan nirxên manewî ya mîrasa dîrokî bi awayekî hemdemî jîndar dibe. Ma ji xwe manewiyat ne ev bi xwe ye û stûnên avahiya manewiyatê ked- dayinekî canfedayî ya bê hember nîn e? Belê ev bi xwe ye. Rastiya Rêbertî û şehîdan, berxwedaniya li çiyan û li zindanan têkoşîna fedekariya gelê Kurdistanê ev cewher bi xwe ye. Nav û naveroka wê ya polîtîk, damêzrîner, rêxistinkar û rêveberî ye. Yanî têkoşîna tevgera azadiyê hûnandina tevna civaka mirovahiyê yê ku hemû motîfên nirx, rûmet û azadiyan li ser vê tevnê dinexşîne.

*Girtîgeha Tîpa F a Boluyê*



## Qerf Henek

Di bin siya yek al û yek neteweyî de




Yek nasname tê ferzkirin




www.arsivakurd.org

# Li Qerejdaxê dengê erbaneyê...

Me digot qey derwêştî di serdemên kevn de maye. Yên di Zerdeşta Neitzche de felesefe dike, di pênûsa Xelîl Cîbran de jîndar dibe, lê dîsa lehengên ji bilî ku dest cîhana rastîn bide pêdiviya mîstîk a giyanê me têr dike... Gotina 'Derwêşên Post Modern' a ji bo hin entellektuelên hemdemî...

İlhamî VURAL / SERÊKANIYÊ - ANF

Lê belê divê kuçeyên bajêr ên di bin kontrola polîsan de, kafeyan, "jiyana me ya muxalîf a ku tê parastin" a îzolekirî biterikanda… Ew ê wê demê bihata dîtin ku derwêşên ku Zerdeşt dîn kiriye, Cîbran xistiye depresyonê hê jî li çiyayên Kurdistanê digerin bihata fêmkirin.

Li ser milekî wî ebayê dirêj, li ser yê din erbaneya wî ya ku di nava telîsekî spî de, wekî mêvanê ku ji zû ve bû li bendê ne ket nava Konê Reş… Yanî konê koçerên ku ji demsalekê ber bi ya din ve ji wî zozanî diçin zozanê din…

Silav da yên ku li hundir bûn li gor rêz û Rêçikan ji mezinan ber bi biçûkan ve, ji mêvanan ta mazûvanan… derbas bû piştre xwe da malnivînkê rûnişt. Îcar jî li ciyê ku çarmilkî runiştîbû, yek bi yek pirsa yên li wir kir û hemû silavdayîn bi "civat û rehmet" bi dawî kir.

Riha wî ya qirêjî, tilîkên wî yên reş ku ji sermayê qermiçî bûn û çefiya wî ya carê ji serî dişemitî, wekî ku zimanê betilandina wî bû… her tiştên wî ger ali mekanên dûr, ji riya dûr hatina wî,nexwarin û venexwarina wî, lê belê tuttişt jî nexwestina wî, dilnizmiya wî vedigot.

Kî ye ev zilam, ji ku hat, kê bangî wî kir, nasê kê ye? Kes nezane û neqetkê… Lê ji bilî min kes rewşê ho venade. Wekî ku her kes hînî vê rewşê ye, ji ber ku tu tiştekî xerîb tunebû li gor kesî… Diyar bû ku nasnameya wî erbaneya li pişta wî bû…



**Dewrêş, devê yekî din vedike**

Vir de wê de gotin, çend meselok, bîranînên kut evli çend navan dibin têne vegotin…Di taliyê de gotin diçin û tên dewrêşan. Wê gavê zimanê mêvanê ku çongên xwe ber bi xwe ve kişandiye û bêsewt guhdarî dike vedibe. Devê Xalê Çeçoyê ku ebayê xwe datîne ser balîfka kêleka xwe vedibe.

Qala "Derwêşê kevn" ku yên di bin kon de hemû wî nas dikin dike. Xuyaye ku her kes her du erbanekarên ku li hemû gundên Qerejdaxê digerin nas dikin: Derwêşê kevn û Derwêşê Nû… Tu westandin li ser Xalê Çeçoyê ku kî dizane belkî jî çend roj in ku ew kon û ev kon digeriya nema. Hêdî hêdî dest û piyên wî ji hev vedibe, li ciyên ku gencîneya peyvên wî têr nedikir bi zimanê bedena xwe gûr dikir axaftina xwe, ji heyecanê di ciyê xwe de nedisekinî. Her du milên xwe vedikir û dişayesand, ji bo Derwêşê kevn digot; " Firehiya erbaneya wî aha ewqas bû" weleh bileh xilşaf nîn e, yên kal ku nas dikirin jî erê dikirin gotinên Xalê Çeço…

**Ji zarokatiyê heta kalîtiyê...**

Û di taliyê de, gava ji vegotinê bêhal dikeve destê wî dirêjî erbaneya wî dibe. Berê di tasekê de avê dixwaze; hinekî vedixwe, bi hinekî jî erbaneya xwe nedawî dike… û dest pê dike lê dide; ji xwe diçe gava lê dide, hay ji derdora xwe nîne Xalê Çeço…

Di taliyê de gava çav li kamerayê dikeve, ji yên dora xwe dipirse; " A va kamerayê cezalî ye gelo?" û mit dibe xalê Çeço…

Xalê Çeço ji zaroktiya xwe heta niha bajar bi bajar, navçe bi navçe, gund bi gund, mezra bi mezra, kon bi kon digere…li ciyê ku diçe bi şev dimîne, li hin deran nas û xizman dibîne, li hin konan Mêvanê Xwedê… kî dizane hê çend derwêşên wekî Xalê Çeço digere li van deran.

**Berê deng hebû…**

Ev muzîkjenên gerok ên li erbaneyê didin hinek ji wan zengil bi erbaneyên xwe ve dikin hinek jê jî dibêjin guneh e û pêve nakin. Miraqdarên erbaneyê gotina ku dibêje " Berî her tiştî deng hebû" dizanin. Ew amûra herî kevn a mirovahiyê dihesibînin erbaneyê. Ev amûra îcada mirovê pêşîn, di nêçîra pêşîn de, ev amûra muzîkê ji çermê heywanan hatiye çêkirin, hê jî li van çiyayan wekî zimanê, dengê îlahiyatê, yê evîne tê zanîn… Ji bo hevdîtina dengê însên û yê xwedê tê bikaranîn erbane.

Tê bawerkirin ku însan bi vî dengî tarîtiyên dilê xwe derdixe. Li gor hinekan, rîtuelên hunerî yên pêşîn ên jiyana ehlî bi vê amûrê hatiye îcrakirin. Zerdeştî jî ji ber vê yekê ye berketiyên erbaneyê ne. Ji ber vê yekê bûye ku pîrozbahiyên biharê bi erbaneyê pêk dianîn. Belkî Êzîdî jî ji ber vê yekê zêde bşi erbaneyê ve hatine girêdan, wan zarokên Melekê Tawis, beriya şiroveya ku di olên îlahî de qala hevdîna dengê însên û yê Xwedê, wan erbane wekî amûreke ku dengê însên û yê xwezayê digihînin hev didîtin.

Û li gorî rîwayetê Derwêşê Evdî, gava ku diçû şer civat li hev kom dibûne û ji bo wî li erbaneyê didane. Vê yekê, ew di şer de wisa bihêz kiriye… Ji ber ku erbanê xwebûn û kesayetiyê şiyar dike… Belkî jî ji ber vê yekê bû, Xalê Çeço piştî ku erbaneya xwe xist kîsikê xwe destûr xwest û çû… Bêdeng… Wekî Derwêşan…



## Ji bo zarokên kurd 'Fîlmê Yekem'

**LONDON**-Derhênerê Îrlandayî û çêkerên bernameyên BBC'yê Mark Couins, belgefîlma ku mijara wî zarokên kurdin a bi navê 'The First Movie(Fîlmê Yekem)' kişandina wî xilas bû. Belgefîlm, dê di serê meha Cotmehê de li Îngilistanê li sînemayên Picterhouse de bê pêşandin. Belgefîlm li başûrê Kurdistanê hatine kişandin û zarokên kurd kirine mijar, belgefîlma bi navê 'The First Movie (Fîlmê Yekem)' di meha cotmehê de li sînemayên Picturehouse tê pêşandin. Fîlm ku ji aliyê derhênerê Îrlandayî û çêkerên bernameyên BBC'yê Mark Couins ve hatiye kişandin. Jiyan û xeyalên zarokên kurd kiriye mijara xwe.

Ji bo kişandina fîlma ku mijara zarokên kurd ekîbekî navneteweyî xebitî. Derhênerê fîlmê Mark Cousinsê Îrlandayî, zarokên kurd,werger Garîp Rauf Ehmed kurd, edîtor Timo Langer almanî, deng qeydkirin Brent Calkin kanadayî, bestekar Melisa Hui hong kongî. Belgefîlm di pêşbirkên fîlmê Royal Television Society û One Word Media de endam hate nîşandin. 'Fîlmê Yekem' dê di navbera 01-26'ê cotmehê de di serî de li Londonê û li gelek bajarên Îngilistanê dê bê pêşandan.

## 'Çogunluk' xelatek bi prestîj wergirt

**VENEDÎK** - Fîlmê bi navê 'Çogunluk' ku derhêneriya wî Seren Yuce kiriye, di Mîhrîcana Fîlman a Venedikê de Xelata Şêrê Pêşerojê wergirt. Fîlm dê tevlî mîhrîcanên Toronto û Portekala Zêrin a Antalyayê jî bibe. Li Vedendîkê xelata Şêrê Zêrînê jî fîlma 'Somewhere' ya Sofia Coppola wergirtibû.

Derhênereya fîlmê ku Seren Yuce kiriye, fîlmê herî dawî yên 'Sînemavanên Nû' ye, Li mîhrîcana fîlmê Venedîkê de 'Xelata Şêrê Pêşerojê' (lion of the future) wergirt. Fîlmê 'Çogunluk' ku serokê pêşbirka juritiya fîlmên yekem derhêner Fatih Akin dikir, di 9'ê Îlonê de di beşa Promiyera Rojên Venedîkê (venice days) kiribû. Gala li sînemeya Sala Darsena hatibû çêkirin. Koordinatorê Rojên Venedîkê Giorgio Gosetti dema ku fîlm dida nasîn wiha got: "Tariye lê fîlmeke komîk e"kir. Temaşevanan bi pirsên xwe eleqeyeke mezin nîşanên derhêner Yuce, lîstikvan Settar Tanriogen, Bartu Kuçukçaglayan û Esme Madra dan. 'Çogunluk' yekemîn fîlmê Yuce ye, derhêneriya ditbarî Bariş Ozbiçer, çêker jî Sevil Demircî û Onder Çakar ku herdu jî ji sînemevanên nû ne.



'Çogunluk' piştî rewîtiya mîhrîcana venedîkê, dê tevli 35'emîn Mîhrîcana Fîlman a Torontoyê û 47'emin Mîhrîcana Portekala Zêrîn a Antalyayê dibe.

## Pirtûka 'Şahnişîna Masiyan' derket

**HEWLÊR**- Dezgeha Aras bo çap û belavkirinê pirtûka "Şahnişîna Masiyan" ya nivîskar Mihemed Ferîq Hesen çap kir, ev pirtûk lêkolîn û komkirina çîrokên gelêrî yên taybet ên civaka kurd e.

Di beşa "Taybetmendiyên Çîrokên Kurdî" de nivîskar behsa çend pirsan dike yek ji wan; kelepûr tevlihev e yan tiştekî din e, her wiha ew dibêje "Kurdistan dergûşa çîrokan e".

Her wiha di beşa "Çîrokbêjan" de, nivîskar navê çend çîrokbêjan tomar kiriye û dibe navê gelekan ji wan ji nav ên çend çîrokên vê pirtûkê nivîsîne û ji nav wan: "Heme Paşa, Hesen Kerîm Marûf, Baba Resûl Îsmail, Îzet Elî Mehmûd, Kemal Ehmed Dolpemewî, Omer Mihemed Mûsa, Mihemed Pîrot Ehmed û Paşa Mihemed Ebdelah."




Hêjayî gotinê ye ku nûser li ser bergê pirtûkê ji aliyê pişt ve wiha gotiye, "Dibe ku di dîroka dûr û dirêj ya me kurdan de qeral û împaratoriyên bi navûdeng nebûn, û dibe ku koşk û kelayên wek Misir û Hindistanê jî nebûn, lê kelepûrekî me yê zarekî mezin û berfireh heye ku hêjayî nivîsînê ye û çîrok jî beşek jê ye."

Tê zanîn Dezgeha Aras bo çap û belavkirinê sala 1999 hate damezrandin û navenda wê li paytexta Herêma Kurdistanê Hewlêrê ye û berî demekê ji pirkûka xwe ya 1000'emîn ji çap kir.

## Belgefîlma "You Are Turkish" jiholêrakirina kurdan vedibêje

**LONDON** - "You Are Turkish" ango "Tu Tirk î" belgefîlmeke nû ye ku derhêneriya wê rojnamevan Yusuf Sayman kiriye. Belgefîlm rewşa kurdan a di salên 80 û 90'î de li bakurê Kurdistanê vedibêje. Wênekêş Yusuf Sayman ku li New Yorkê dimîne di bihara 2010'an de ji bo kişandina fîlma xwe serdana bakur û başûrê Kurdistanê kiribû .

Yusuf Sayman ronahiya kameraya xwe dide ser kesên ku rastî îşkencekirinê hatibûn, ew li ser şêweyên îşkencekirinê di Girtîgeha Amedê de diaxivin.

Belgefîlm bal dikşîne ser qedexekirina ziman û nasnameya kurdan, valakirin û şewtandina gundan, kuştina ajalan, koçberiya ber bi metrepolan ve û her wiha behsa penabertiya kurdan a Maxmûrê dike, cihê ku dîsa destê kujeran digihêje wan. Di belgefîlmê de, xêncî hevpeyvînan, wêneyên balkêş hatine bi cihkirin ku trajediya kurdan ji temaşevanan re baş vedibêje.

Sayman derbarê nasandina gunehên dewleta tirk de pispor e. Nemaze ku bavê wî kevneserokê komeleya parêzeran li Stenbolê bû, ew jî neçar mabû ku di salên 70'yî de sirgun bibe. Sayman pêşangehên wêneyan li New York, Berlîn, Amersfoort û li Çînê jî çêkirine, wêneyê wî di gelek rojname û kovaran de hatine weşandin. Hêjayê gotinê ye ku fîlm di 14 Tîrmeha borî de li Kings College li Londonê de hatibû nîşandan. Fîlm bi tirkî û kurdî ye, herwiha jêrnivîs bi îngilîzî ye.

Rupel 12+++++:Layout 1  16.09.2010  13:21  Page 1


# Rojeva Welat

17 Îlon 2010 Hejmar: 10 Sal:1    www.welat.com

**ROJEVA WELAT**
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü:
Sevim KAPLAN

*Yönetim Yerî:*
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
*İdare Tel:* 0 (412) 251 38 88

*Yayın (Weşan)*
*TEL:* 0 (412) 237 48 90-91
*Fax:* 0 (412) 237 48 89
Baskı *(ÇAP):*
*Stenbol:* Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Edene:* Arslan Güneydoğu
Gazetecilik, Matbaacılık,
Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
*No:* 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.




## Lêgerîn di pir hêlan de birîna mirovan derman dike. Dibe bersiva hest û mereqa mirovan. Jiyana gêrîlayan bi hemû hêlên xwe dibe bersiv ji lêgerînên te re. Di gereke biçûk de tu dikarî hemû hestan bi hev re bijî

## Berhem û giyanê kar

Dibe ku pir kes mîna min meraq dikin gerîla di milê aborî de pêdiviyên xwe ji ku derê digirin? Di vê gera xwe de tiştê ku min xwest ez nas bikim yek ev bû. Destpêkê de bexçe hebû lêbelê dawiya wê dîtin hinekî zor bû. Gerîla bexçeyekî pir mezin çandibûn. Di bexçeyê de hemû rengê mêwe hebûn. Belê ev bexçê ku li ber çavê me ye di encama ked û çebayê gerîla de bûye xwediyê vî berhemî. Di hevpeyvîna xwe ya bi gerîlayê ciwan re Cûdî Mêrdîn yê ku di sala 2006 de bejdarî gerîla bûye, me naskir ev bexçe çawa hatiye çandin. Cûdî di gotinê xwe de bal kişand ser ruhê gerîla yê komîn û wiha dewam kir " di destpêka Biharê de hemû hevalên me yên gerîla jin û xort bi hev re kom bûn û erd kolandin, bi hev re jî çandin. Pişt re em sê heval li ber bexçe man. Di her demekê de grûpek gerîla dihatin alîkariya me ji bo paqijkirina bexçyê. Me bi xwe avdanî dikir".

## Xwarinên gerîlayan ên zivistanê

Cûdî di gotinên xwe de behsa amadekariyên gerîla ji bo zivistanê kir û wiha axivî: " Hevalên me yên gerîla ji bo zivistanê bacanê sor hişk dikin û tirşoyê îsot û sebzeyên dîtir çêdikin."

Wê roja ku em çûne serdana gerîlayên li bexçeyê dimînin. Komek gerîla jî hatibûn bacanê sor hişk dikirin. Gerîla di nava xwe de kar hevbeş kiribûn. Hineke bacan komdikirin, hineke dikşandin, hineke hûr dikirin û hineke jî xwê dikirin û li ber rokê dûz dikirin. Te ji xwe re dixwest li şêweyê karê wan temaşe bike. Herkes bi hev re dixebitî, bi hev re navber didan û bi hev re çayê vedixwarin. Di nava wan gerîla de jin jî hebûn. Ji her çar parçê Kurdistanê gerîla hebûn. Tu dema van dîmenên xebitînê gerîla ya komîn dibînî, tu ji xwe re dibêjî! di malbatekê de xwişk û bira nikarin bi hev re karekî bikin lê belê ev ne xwişk û birayê hev in û her yek ji derekê tevli bûne, lê belê dîsa jî tu heyrana şêweyê karkirina wan dimînî.

# Gêrîla bê çiya nabe û çiya jî bê gerîla nabe

**DUNYA PALE- BEHDÎNAN / ANF**



Di civakê de tu nikarî di rojekê de hem xemgîn bibî, qehir bikşînî û hem jî dilşad bibî. Lê belê gerîla di meşeke biçûk de van hestan û hîn zêdetir bi hev re dijî. Em di rê de westiyan û bê av man, lewre me pir bêriya avê kir û dema ku me av dît ji kêfa re em firiyan. Çawa ku bi derketina rojê û çûyîna wê re tu dibe heval wisa jî tu bi hewayê hênik re dikevî nava pêşbirkê de.

Gerîla berî herkesî silav dide rojê û dawiya herkesî xatir jê dixwaze. Bîranîna vê rojgariyê her ku tu bikarbî bi lêv bikî tu ewqasî romanên gerîla dikare bide nivîsandin. Di rê de her tiştek xwedî wateyekê ye. Dema ku em ketin rê de ez pir biyaniyê jiyana gerîlayan bûm. Her tevgerekî wan dibû pirsnîşan di mêjiyê min de. Min dixwest ez bedewbûna her tiştekî hîsbikim. Meşa di berbanga sibehê de, di rokê de û di ronahiya heyvê de, tu kîjan hestan dijî? Min dixwest ez hîsbikim. Di vê rêkê de bê ku ez hîsbikim, min hemû hest bi hev re jiya. Hemû hest di rojekê de jiyîn gelo çi bi xwe re dide afirandin?

### Şiveriyên gerîlayan …

Di dîrokê de dema ku mirov di çolan de birçî diman, qedera xwe radestî wê çolê nedikirin, rojekê jî jibîr nedikirin ku dê bighîjin hesreta xwe ew jî gihîştina welatê xwe. Di wê çolê de her çiqasî bê şekal û bixwas geriyane, bê av mane û li pêşiya wan bi hezaran mirov mirine. Lê belê gava ji çolê dûr dikevin ji bo ku wan mirovên ku mirine û wan zoriyên xwe jibîr nekin, dîsa li ser axê bixwas digerin. Dema ku lingê wan digihîjê axê mîna ku bihuşt bi destê wan dikevê û di wijdan de xwe rehet hîs dikin, ji ber ku ew mirovên di çolê de li kêleke wan miriyan û bîranînê her çiqasî bi jan û zor bin jî, jibîr nekirine. Şiveriyên gerîla jî wisa ne. Di van şiveriyan ku em tê de meşiyan pir gerîla jiyana xwe ji dest dane. Lewra her ku tu di wan rêka de dimeşê bi sedan mirov û bîranîn têne bîra te. Mirovên mîna min biyanî ne ji jiyana gerîla dema ku di şîveriyên de dimeşin û kincê wan toz digirin dibe ku bibêjin em gemar bûn, yan jî ew şopên di rê de, dibe ku ji bo te wateya xwe nîn be. Lê belê gerîla dema ku di wan şiveriyan de dimeşin, wan şopan dibînin û ew toz tê ser kincên wan, jan bi dilên wan dikevê ji ber ku bi hezaran hevalên wan yê jiyana xwe ji dest dane, di van riyan de meşiyan e. Bîranînên gerîla di van riyan de jiyane, ne hindik in.

### Bîranînên şer yên gerîla…

Em çar kes ketin rê de, di grûpa me de du gerîlayên kevn hebûn. Ez di milekî de xwedî şens bûm, ji ber ku her du gerîla jiyana xwe di şer de derbas kiribûn. Di rê de her du gerîla ji me re behsa şer û gerîla kirin. Rastiya gerîla bi çend peyvên zêrîn bi me dane guhdarkirin. Pir bîranînên ku di şer de jiyane bi me re parvekirin. Dema ku min guhdar dikir, ez ketibûm navbeyna xeyal û rastiyê de. Pir tişt di wan bîranîna de ji min re balkêş dihatin. wêrekiya gerîla di şer de bala min kişand.

### Dilsozî û bawerî

Rexmî ku dewleta tirk hemû rengê çekan li dijberî gerîla dide bikaranîn lê belê nikarê gerîla tune bike. Baweriya gerîla di zoriya de û di çiya de mîna pola lê hatiya, gerîla Xeyrî ji Wanê ye ku di sala 1993'yan de tevli gerîla bûye û cihê birîna di bedena wî de mîna şopên dîrokê lê hatine, di gotinên xwe de ev anî ziman û wiha dewam kir; "di şer de tişta ku ji me re zor dihat li kêleka me şehadeta hevalên me bû. Lê belê her ku hevalek li pêşiya çavê me şehîd diket hîn zêdetir bawerî, ruhê berxwedaniyê û girêdana hevaltiyê bi me re dihate çêkirin. Lewra dewleta tirk her çiqasî bixwazê me tune bike, hêza wî têrê nake ku me ji diyarêb me yên manewî dûr bixînê. Ev dilsoziya me ya bi şehîdan û Rêber Apo re bi ked û xwînê, me daye avakirin."

Di berbanga sibehê de em bûn hevalê stêrkan, di nîvro de em bûn hevalê rokê û di şevê de em bûn hevalê tavaheyvê. Westandin, birçîbûn û tîhnibûn bi me re hevalbend bûn. Gerîla jiyana xwe nas dikin li gorî wê tedbîrê xwe digirin. Xwarin û av bi xwe re digerînin. Li ku derê dixwazin li wê derê navber didin û bêhna xwe distînin. Carna ez diwestiyam lê belê bedewbûna bergeha li derdorê me hêz dida min. Min dixwest ez wê bergehê hemûyî di mêjî, dil û çavê xwe de veşêrim. Ji ber wisa min wêneyê wê bergehê hemûyî kişandin.

### Sîmayên ruyê wan hêz dida me

Em di rê de bûn min carekê dît bi gurîna avê re ji asoyên çiya dengê repa repa lingan tê. Ew dengê repa repa lingan bi heyecan bû, gelo ev kî ne? Min carekê dît gerîla hemû ketine pey hev de bi rext û çeka xwe di palên çiya de, direvin. Yekem pirsa ket serê min de ev bû, gelo ev çawa dikarin di van çiyan de birevin û perwerdehiya xwe bibînin? Bi taybet di nava wan de gerîlayên jin jî hebûn. Li ser wê westandina xwe re bi ruhekî germ û bi heyecan nêzî me bûn. Ruyê wan bi hibra xwêdanê hatibû neqşkirin. Sîmayên ruyê wan hêz dida me ji bo em riya xwe dewam bikin. Em dema ku di riyekê de diwestin destpêkê em diqehirîn û ruyê me tirş dibe, em di rêkên rast de dimeşin. Lê belê gerîla her çiqasî hildikişin çiya û diwestin jî, lê belê fêrî şert û mercên çiya bûne, bi hesanî hêrs nabin.

# Hêza îradeyê çi ye min bi çavê xwe dît



Gerîla jiyana xwe bi keda xwe dijî. Di gera xwe ya nava gerîla de min ev dît. Her cihekî ku em diçûn me gerîla didîtin. Yek ji wan gerîla jî Ferhad Sêrt bû. Ferhad Sêrt gerîlayekî pir kevn bû. Lê belê ji ber kesayeta wî ez matmayî mam. Ji ber ku li çiya dijiya, tevlibûna şer û hemû karkirin, pir zor e, tu bawer bike divê ev bê dîtin.

Ferhad Sêrt dema ku ji dayik dibe ling û destên wî seqetin. Bi gopal dimeşe, lingê wî seqeta û kurte. Tiliyên destê wî pir kêm in. Lê belê bi vî halê xwe jî bi fermandarê leşkerî yê ku di 15 Tebaxê sala 1984 dest bi pêngava 15'ê Tebaxê kiriye û şerê têkoşîna çekdarî îlan kiriye, Egîd (Masum Korkmaz) re dixebite. Sala 1992'yan tevli gerîla dibe û ji wê demê de li çiya ye.

Ferhad Sêrt li qada Botanê dimînê û tevli şer dibe. Dema ku tu ji xwe wateya îradeyê bipirsî, tu dikarî bersiva wê di kesayeta gerîla Ferhad Sêrt de bibînî. Dema ku min gerîla Ferhad dît meraqa di çiya de çawa dijî li min çêbû, lewre bi pirskirinê re ez ketim nava sohbetê de bi gerîla Ferhad re. Her qermîçonkeke ruyê wî îfade rastiyekê dikir. Bi dilê tecrûbe û ruyê xwe yê zelal ket nava bîranînê ku di şer de dijî. Ferhad di gotinên xwe de anî ziman ku her mirovekî kurd dikare di çiya de cihê xwe bigire û wiha berdewam kir " Ez dema ku tevli gerîla bûm, herkes matmayî ma ez ê çawa di çiya de bi vî halê xwe bijîm. Lê belê rastiya PKK'ê û hevaltiya çiya hêza min a herî mezin bû. Eger ez bi vî halê xwe dikarim di çiya de li îrade û nasname xwe bigerim, demekê her ciwanekî kurd dikarê tevli gerîla bibe. Dikarê biryara jiyaneke serfiraz û bi rûmet bide. Cihê jiyana serfiraz û birûmet, çiya ye" Gerîlayekî pir jêhatiye û xwedî huner e. Bi wî halê xwe bexçe diçînê û bi her tiştê bexçe re mijûl dibe. Di heman demê de di dirûtina kincê gerîla de hosta ye. Tu her dixwazî li civata wî rûnêyî û li bîranînê wî yê gerîlayetî guhdar bike.

Bi avêtina her gavekê re tu nefesekê dikşîne, bi her nefesekê re tu bîranînekê jiyan dike û bi her bîranînekê re tu hesretekê dijî. Asoyên çiya, spehîbûna xwezayê, jiyana gerîla û qermîçokên ruyê mirovan, ev bi min da naskirin.